# ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ

## 5

2020/2021

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya zimanê kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê.**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, weke pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


| BEŞA YEKEM | 7 |
|---|---|
| HEVALTÎ | 8 |
| XUNC Û XECOKÊ | 14 |
| KOMÎN | 21 |
| SIMO, SOFÎ Û MELA | 28 |
| TÊKILIYÊN CIVAKÎ | 30 |

| BEŞA DUYEM | 33 |
|---|---|
| EM WELATÊ XWE NAS BIKI | 34 |
| TIL HELEF | 40 |
| GUNDÊ MÛRIYAN | 47 |
| ŞEHÎD PEYMAN | 52 |
| ALA RENGÎN | 59 |

| BEŞA SÊYEM | 63 |
|---|---|
| ELEKTRÎK | 64 |
| ENTERNÊT | 70 |
| ENDAZYAR | 75 |
| STÊRK | 81 |




| | |
|---|---|
| **BEŞA ÇAREM** | **85** |
| MAMÊ HESINKAR | 86 |
| COTKAR | 92 |
| BIJÎŞKÎ | 98 |
| DIRÛNKAR | 106 |
| NANPÊJ | 112 |

| | |
|---|---|
| **BEŞA PÊNCEM** | **115** |
| KERÊ DEREWÎN | 116 |
| DESTPAKÎ | 123 |
| ZENGILÊ DADMENDIYÊ | 128 |






# BEŞA YEKEM

## Waneyên Beşê

- Hevaltî
- Xunc û Xecokê
- Komîn
- Simo, Sofî û Mela
- Têkiliyên Civakî

## Armancên Beşê

1. Naskirina hevaltiya rast.
2. Naskirina hevkarî û girîngiya wê.
3. Naskirina komînê û girîngiya wê.



# HEVALTÎ





## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Tu di wêneyê yekem de çi dibînî?
2. Tu di wêneyê duyem de çi dibînî?
3. Tiştên hevbeş di navbera her du wêneyan de çi ne?
4. Tu ji hevalên xwe hez dikî?

Carekê ji caran, Ciwan ji dibistanê qut bûbû û êdî heya demekê nikarîbû biçe dibistanê, ji ber ku lingê wî şkestibû û li gorî xwesteka bijîşk, ew heta mehekê nikare biçe dibistanê.

Ji bo ku wane li wî neçin, her roj hevala wî Rûken piştî ku ji dibistanê vedigeriya malê, di dema piştî nîvro de, berê xwe dida mala Ciwan û waneyên ku mamoste ji wan re şîrove kiribûn, bi Ciwan re parve dikir.

piştî ku dem bihûrî, êdî Ciwan dikare tevlî dibistana xwe bibe. Roja ku Ciwan li dibistanê vegeriya, hemû xwendekar û mamosteyan bixêrhatina wî kir û kêfxweşiya xwe anî ziman. Ciwan, bi vê helwesta mamoste û hevalên xwe ya li hember wî, pir dilşad bû û weha got:
“Mamosteyên min ên hêja û hevalên min ên delal; ez pir kêfwxeş im ku careke din ez li dibistana xwe vegeriyam û pir bextewar im ku hevalên mîna we li gel min hene”.
Piştî vê gotinê, Ciwan berê xwe da hevala xwe Rûkenê û li hember mamoste û xwendekaran, spasiya wê kir.

Dema ku mamosteya wan, ev tiştê ku Rûkenê kiriye bihîst, pir kêfa wê hat û weha ji wê re got:
“Her bijî Rûken! Te karekî pir baş kiriye û ez dixwazim hûn hemû xwendekar jî wisa bin; bi hev re alîkar bin û ji hev hez bikin. Heger em wisa bin, her dem dê serkeftin para me be”.



Her weha mamosteya wan wisa berdewam kir: Hevaltî, nîşaneya hezkirin, rêzgirtin û hevkariyê ye. Hevaltiya rast, ew hevaltiya ku mirov amade be ku her dem bi hevalên xwe ve rabe û her dem alîkarî û hevkariyê ji wan re pêşkêş bike û hevalên xwe ji tenagasiyan rizgar bike.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çima Ciwan nikarîbû biçe dibistanê?
2. Ji bo ku waneyên Ciwan li wî neçin, Rûkenê çi dikir?
3. Mamoste û xwendekaran, çawa pêşwaziya Ciwan kir?
4. Piştî Ciwan vegeriya dibistanê, li hember mamoste û xwendekaran, çi helwest nîşan da?
5. Piştî ku mamoste karê ku Rûkenê kiriye bihîst, çi got?
6. We çi sûd ji çîroka Rûken û Ciwan wergirt?
7. Dema ku pirsgirêkek bi hevalekî/e te re çêbibe û pêwîstiya wî/ê bi alîkariyê hebe, tu dê çawa tev bigerî?
8. Di nêrîna te de, çima di jiyanê de hevaltî tiştekî girîng e?

# HÎNDARÎ

**1.** Em wateya peyva sorkirî hilbijêrin:

**a.** Hevaltî, **nîşaneya** hezkirinê ye:

(Wateya - Sembola - Rastiya)

**b.** Xwe ji **tengasiyan** rizgar bike:

(Zehmetiyan - Xweşiyan - Şahiyan)

**c.** Waneyên ku mamoste **şîrove kiribûn** bi Ciwan re, parve dikir:

(Destnîşan kiribûn - Xwendibûn - Zelal kiribûn)

**d.** Piştî ku dem **bihurî**, êdî Ciwan dikare tevlî dibistana xwe bibe:

(Derbas bû - Nema - Dirêj bû)

**e.** Ciwan bi vê **helwesta** mamoste û hevalên xwe dilşad bû:

(Tevgera - Nerîna - Hezkirina)

**f.** Ez pir **bextewar** im ku hevalên mîna we li gel min hene:

(Baş - Bi kêf - Xwedîşans)

**2.** Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:
Ji bo ku waneyên wî .........., her roj hevala wî .......... piştî ku ji dibistanê .......... malê, di dema .......... de, berê xwe dide mala .......... û waneyên ku mamoste ji wan re .......... bi Ciwan re ..........



**3.** Em peyvên li jêr, bigihînin dijwateya wan:


- Kêfxweşî
- Serkeftin
- Hêja
- Pêşkêşkirin


- Bênirx
- Xemgînî
- Binkeftin
- Veşartin

## DERBIRÎN:


Li wêneyên li jêr, baş temaşe bike û mijarekê derbarê wê de binvîse. Hewl bide ku tu van xalan di ber çavan re derbas bikî:

Navên kesan - Navê cih - Cureya alîkariyê





# RÊZIMAN



Seydayê Cegerxwîn digot: **“Ger hûn nebin yek, hûn ê biçin yek bi yek”**.
pêşiyên me dibêjin: **“Mêr dimire, nav dimîne; ga dimire çerm dimîne”**.
Ev hêma (**“ ”**) navê wê **dunik** e.

## RÊGEZ:

Gava mirov bixwaze gotinekê ji devê yekî/ê bigire û çawa hatibe, veguhêze, ew gotin di nava **dunikê** (**“ ”**) de tê nivîsîn.

## RAHÊNAN:

Em dunikê di cihê guncaw de, bi kar bînin:

1. Dapîra min dibêje: Divê mirov rastgo be.
2. Hevalê min got: Di jiyanê de dilsozî gelekî girîng e.
3. Bavê min digot: Rêzgirtina ji mezinan re, ji taybetiyên mirovê qenc e.
4. Rustem dibêje ku em ê waneyên xwe, xweş şîrove bikin.

# XUNC Û XECOKÊ





## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Li wêneyên li jor baş temaşe bike, hûn çi dibînin?
2. Çima mirov hevkariya hev dikin?
3. Ji bilî hêsankirina kar, hevkarî çi diafirîne?
4. Ji jîngeha ku tu lê dijî, serpêhatiyeke girêdayî hevkariyê bibêje.

Li bin siya dara tûyê, mûriyeke şêrînok bi navê Xecokê, li liv û tevgera mêşên hingiv temaşe dikir. Mereq kir û hinekî nêzî kewarê bû. Li rex kewarê biçûkên mêşên hingiv dilîst. Di demeke kin de, hevalekî wê çêbû, navê hevalê wê, Xunco bû. Her sibeh, li bin siya darê hev û du didîtin û bi hev re dilîstin. Rojekê her duyan dabaşa jiyana hundirê mûristan û kewarê kir.



Xecokê pirsî:

Hundirê kewarê çawa ye û jiyana we çawa derbas dibe?

Xunco: Di kewarê de, birêkûpêkiyeke pir balkêş heye; her kes kar dike.

"Hevkarî sembola me ye."

Mêşên karker bi dehên kîlometreyan ji kewarê dûr dikevin û ji gulan şîravê distînin. Wê şîravê di hundirê, kewarê de, dikin hingiv.



Dema ku mêşeke hingiv çêrgeheke têrgul bibîne, hinekî bi jor de difire û nameyekê ji mêşên dîtir re bi rê dike. Bi lez mêş amade dibin û hevkariya hev dikin û wê şîravê dikin hingiv. Her weha di avakirina kewarê de, her kes bê ezezîtî tevlî kar dibe.

Her weha ew hingivê ku em depo dikin, di dema guncaw de, her kes dixwe.
Xecokê:
Jiyana we pir xweş e, mîna jiyana me ye!
Xunc: jiyana we mûriyan çawa ye?
Xecokê: Jiyana me nola jiyana we ye; her kes bê dudilî kar dike. Di werzê havînê de, em qûtên xwe berhev dikin. Em genim, ceh, nîsk … depo dikin û di werzê zivistanê de, em xerç dikin. Dema ku mûriyek rastî berhemeke mezin tê, gazî hevalên xwe dike. Çend mûrî li berhema mezin dicivin û wî barî, bi hev re, hildigirin. Em mûrî tevî biçkbûna qebareya me, em dikarin heta **27** caran li senga xwe hilgirin.
Xunc: Hûn mûrî çawa xwe diparêzin?
Em mîna yek destî xwe diparêzin; heta di mijara parastinên de jî rêgeza me yek e: **“Yek ji bo hemûyan, hemû ji bo yekî ne.”**
Xunco: Kewara me li ser çiqilên daran, an di çiyayan de, tê avakirin.
- Hevala Xecokê, hûn çawa di jêrerdê de, dijîn?
Xecokê: Di jêrerdê de, em xaniyên xwe saz dikin. Em bi hev re, odeyên biçûk ava dikin. Her kes bê zexelî kar dike, lewra ew mûristana mezin, bi kedeke hevbeş û endazyariyeke xurt tê holê.
Xecokê û Xunco bi hev re gotin:
- Hevkarî jiyanê hêsan, xweş û bi wate dike.



**WATEYÊN PEYVAN:**

**Kewar:** Mêşdank

**Mûristan:** Cihê mûriyan

**Şîrav:** Ava gulan

**Deopkirin:** Enbarkirin

**Qebare:** Gewd

**Seng:** Giranî

**Zexelî:** Tiralî

# GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Kê li liv û tevgera mêşên hingiv, temaşe dikir?
2. Xecokê û Xunco, dabaşa çi dikir?
3. Gotina Xunco, “hevkarî sembola me ye,” şîrove bike.
4. Dema ku mêşa hingiv, çêrgehekê dibîne, çi dike?
5. Şîrava gulan, çi ye? Tu û hevalên xwe vê mijarê gotûbêj bikin.
6. Hingiv kengî tê xerçkirine?
7. Ji bo çi mûrî, qût didin hev û depo dikin?
8. Mûrî bi saya çi xwe diparêzin?
9. Em çi encamê ji vê waneyê digirin? Bi du hevokan rave bike.

# HÎNDARÎ

1. Em gotinên li jêr di hevokan de, bi kar bînin:

**sembol - şêlik - qebare - seng**

2. Em bi hev re hemwateya peyva "**gur**" li gorî hevokê destnîşan bikin:

- Gur ket nav pez. ( )
- Bû gurgura tavan. ( )
- Giya li mêrgê gur bû. ( )
- Agirê Newrozê gur bikin. ( )

3. Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

– Jiyana me ............... jiyana we ye.

– Di kewarê de,...................... pir balkêş heye.

– ...............me li ser çiqilên daran di ................de, tê avakirin.

4. Em peyvên pirjimar bikin yekjimar:

| **Pirjimar** | **Yekjimar** |
|---|---|
| Mûriyan | ............ |
| Kewaran | ............ |
| Mêşan | ............ |



## RÊZIMAN

Di çileyê zivastinê de, çirçirk çû gel mûriyê ji bo ku hinek qût ji zarokên xwe re peyda bike, lê mûriyê qût neda çirçirkê. Mûriyê wisa bersiv da: “Dema min di çileyê hav-înê de, pişta xwe bi qayîşê girê dida, te ji xatûnan re li tembûrê dida û nedihişt razên.”

– Di deqa li jor de, çima peyvên **“hevînê û tembûrê”** bûne du parçe?

– Bi çi hêmayê ji hev parçe bûne?

## RÊGEZ:

Peyva ku di rêzê de, bi cih nebe û ji hev tê qutkirin, bi **“bendikê”** tê girêdan.

– Em bendikê di cihê guncaw de, bi kar bînin.

1. Werziş, vexwarina avê û xwarina mêweyan, ji bo ten duristiyê pir bi sûd in.
2. Li Kurdistanê, pir çem û rûbar hene, her weha du gol ên navdar jî hene.



# KOMÎN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Di vî wêneyî de, çima mirov li hev kom bûne?
2. Gund an jî taxa ku tu li wê dijî, civînên bi vî rengî lê çêdibin?
3. Navê komîna te çi ye û çima ev nav li wê hatiye kirin?
4. Li herêma we, pêdivî çawa tên bidestxistin û pirsgirêkên jiyanî di rêya çi re, tên çarekirin?

Di dîroka mirovahiyê de, her dem mirov bi awayê kom jiyane û bi şêwazekî komînal, kar û xebatên xwe bi hev re meşandine; hev û du parastine û jiyana xwe li pêş xistine.

Di jiyana me ya îro de jî wekî ku em dizanin, li welatê me, li her gund, bajar û taxekê komîn hatine avakirin.

Komîn, tê wateya ku komeke mirov li gundekî yan li taxekê, kar û barên xwe yên jiyanî bi rê ve bibin û hemû pirsgirêkên xwe ji hêla çandî, tenduristî, civakî, aborî û ewlehî, çare bikin. Her kes bê cudahî, tev li karê komînê dibe û cihê xwe tê de digire û li hember endamên din dibe xwedî erk û maf.

Komîn, ne tenê ji bo peydakirina nan, av û pêdiviyên gund an taxê ye, lê belê ew bi pêşkeşkirina raje, alîkarî û rêxistinkirina jiyana civakî têkildar e. Komîn, mehê carekê yan jî li gorî pêdiviyan civîna xwe li dar dixe û hemû endam tê de amade dibin. Her kes dikare nêrînên xwe bi awayekî azad, di komîna xwe de bîne ziman.

Di hundirê her komînekê de, gelek komîte hene û her komîteyek karekî diavêje ser milê xwe. Mînak: Komîteya Perwerdeyê, Komîteya Rajeyê, Komîteya Tenduristiyê, Komîteya Ewlehiyê û hwd.

Her komînek, du hevserokên wê hene, yek jin û yek jî mêr e û ji bo birêvebirina komînê, kar û barên wê, bi hev re dibin alîkar.



Wekî ku hûn dibînin, komîn karekî civakî ye. Di komînê de, wekhevî, hevkarî û rêzgirtin pir binirx û watedar in û ji bo bipêşxistina jiyaneke hevbeş, roleke pir girîng dilîze.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Di dîrokê de, mirov her dem çawa jiyane?
2. Çima pêwîstiya mirovan, bi awayê jiyana komînal heye?
3. Li gorî te, mirov bi tena serê xwe û dûrî civakê dikare bijî?
4. Di hundirê her komînekê de, çi heye?
5. Erka endamên komînê li hember civakê çi ye?
6. Di komînê de, çi binirx û watedar in?

## HÎNDARÎ

1. Em ji nav vebijêrkên li jêr, wateya peyva sorkirî hilbijêrin:
   - **a.** Bi **şêwazekî** komînal, xebatên xwe bi hev re meşandine:
     (Awayekî - Karekî - Alîkarî)
   - **b.** Her kes bê **cudahî** tev li karê komînê dibe:
     (Tevlihevî - Sînor - Cihêtî)
   - **c.** Li gorî **pêdiviyê** civîna xwe li dar dixe:
     (Demê - Pêwîstiyê - Berjewendiyê)
   - **d.** Wekhevî, hevkarî û rêzgirtin pir **bi nirx** û watedar in:
     (Hêja - Baş - Bi wate)
2. Em gotinên li jêr di hevokên guncaw de bi kar bînin:
   – Pirsgirêk
   – Rêzgirtin
   – Hevkarî
3. Em li gorî waneyê, hevokên li jêr sergihayî bikin:
   – Komîn tê wateya ku ............................ bi rê ve dibin.
   – Komîn mehê carekê ............................ li dar dixe.
   – Di komînê de .................................... û watedar in.



## DERBIRÎN:

– Hevokên li jêr baş bixwîne û ji wan mijareke birêkûpêk saz bike:

1. Di demeke kurt de, ev pira bi saya jiyana komînal hat çaksazkirin.
2. Her malekê li gorî karîna xwe, tiştên pêwîst pêşkêş kirin.
3. Hinan çemento, hinan xîz û hinan alavên veguhestinê.
4. Sala çûyî, ji ber baran û lehiyên zêde, pira gund xirab bû.
5. Gundî li hev civiyan û biryara çaksazkirina pirê dan.
6. Me alîkarî ji şaredariyê xwest, lê ji ber kêşwera zehmet, zû bi me ve nehat.

## ÇALAKÎ:

Hûn jî serdana komîna xwe bikin û kar û barên wê nas bikin.

## RÊZIMAN

– Ez ê ji hevalên xwe re ...
– Em pir ji wan ...
– Karên cotkaran ...

1. Gelo hevokên li jor, sergihayî ne?
2. Çima hevok bi dawî nebûne?
3. Çi hêma li dawiya wan hatiye bikaranîn?
4. Ev hêma ji çend xalan pêk hatiye?
5. Pêwîst e em çi navî li wan bikin?

## RÊGEZ

**Sêxal**, li dawiya hevokên neqediyayî tê dayîn.

- Em hêmaya guncaw li dawiya hevokê bi kar bînin:

1. Tu wî mirovî nas dikî
2. Ev kar ji mêj ve
3. Ew çû malê
4. Di destê Peyalê de, pênûs, çente

- Em bi hev re, sê hevokên ku sêxal di wan de hatibe bikaranîn, binivîsînin.

..............................................................
..............................................................



## Rênivîs

Her gel bi zimanê xwe tê nasîn, lewra ziman û hînbûna ziman tiştên girîng in.
Seydayê Cegerxwîn, di helbesteke xwe de, weha dabaşa girîngiya ziman dike:

**Vejîne zimanê xwe ey xwendevan**
**Nebûye milet hîç kesek bê ziman**

**Zimanê me xoş û xeroş û ciwan**
**Eger baş bizanî tu nakî zîyan**

**Tu kurmancîya xwe ji bîr nekî**
**Eger baş nizanî divê zêde kî**

Em helbesta li jor baş bixwînin û weke rênivîs binvîsin.



# SIMO, SOFÎ Û MELA

Simo, piştî ku paltoyê xwe firot sofî, hinekan ji wî re got: “Te paltoyê xwe gelekî erzan firotiye”. Bi vê yekê, Simo poşman bû û çû gel sofî.

Simo got: “Te fen li min kiriye”.

Sofî: “Te diravên xwe girt û min jî paltoyê xwe bir, vê gavê tu doza çi dikî?”

Yek ji wî û yek ji vî, tiştek nemabû ku şerekî mezin di navbera wan de çêbibe. Hin mirovên xêrxwaz, ew şandin cem mela. Mela piştî çîroka wan nas kir, ji Simo re got:

– Tiştekî te bi sofî re tune ye, de rabin biçin karê xwe.
– Melayê min, mane hûn dibêjin bazara bi dînan re betal e!
– Seyda wek hinek wî ji xew şiyar bikin û got: Sofî, gotina Simo rast e. De zû paltoyê wî lê vegerîne û bila ew jî diravên te li te vegerîne.

## WATEYÊN PEYVAN:

**Palto**: Çakêt

**Xêrxwaz**: Kesê ku xêrê dixwaze.



## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çima Simo piştî firotina palto poşman bû?
2. Sofî çi bersiv da Simo?
3. Mela destpêkê, doz ji kê re xist?
4. Çima mela biryara xwe guherî?
5. Navekî nû ji waneyê re binivîse?
6. Te çi pend ji vê çîrokê girt?
7. Gelo divê mirov rêzgirtinê ji mirovê dîn re bigire û çima?

## HÎNDARÎ

1. Em di hevokên li jêr de, wateya peyva “**doz**” binivîsin:
   - Vê gavê, tu doza çi dikî?
   - Doz li mirovê zordar, hat vekirin.
   - Divê doza kurdî, bê çarekirin.
2. Em ji waneyê, hemwateya peyvên li jêr binivîsînin:
   - Pere:
   - Kirîn û firotin:
   - Buha:

## DERBIRÎN

Di dîrokê de, kesên mîna Simo hene; hem bi dînbûna xwe û hem jî bi bîrweriya xwe pir navdar bûn.

– Bi çend xêzan çîroka kesayeteke bi vî rengî binivîsîne.



# TÊKILIYÊN CIVAKÎ



Li nav baxên Kurdistan
Hene pir nirxên giran
Ji mêjûya pir kevnar
Ev rewişte hat hinar
Danûstandin bi nermî
Bê ezezî, ez xwezî
Tev li hev tên civanê
Rûdinên li eywanê
Kesên zana û xizan
Tev dewlemend û hêzan
Parve dikin jiyanê
Bê dudilî, bi hêsan
Çiqas xweş e ev jiyan
Li nav civata kurdan

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Her du malikên li jêr şirove bike:

**“Li nav baxên Kurdistan**
**Hene pir nirxên giran**
**Ji mêjûya pir kevnar**
**Ev rewişte hat hinar”**

2. Li gorî malika sêyan çi taybetiya danûstandina kurdan heye?
3. Ji malika sêyan tu çi encamê werdigrî?
4. Serenavekî nû ji helbestê re hilbijêre.
5. Malikekê hilbijêre û wê bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîse.

## HÎNDARÎ

– Em peyv û hemwateya wê bighînin hev:

| | |
|---|---|
| Bax | Guman |
| Mêjû | Xwedî hêz |
| Hinar | Komkirin |
| Civan | Bostan |
| Hêzan | Şandin |
| Dudulî | Dîrok |



# AGAHIYÊN WÊJEYÎ

## HELBEST

Helbest, cureyeke ji nivîsên wêjeyî ye. Di helbestê de, peyv bi rengekî xweşik û bedew li hev tên hûnandin. Ev lihevhatina peyvan, muzîkeke xweş diafirîne.

## MÎNAK:

Bijîn kesên ku ji bo ziman dikin xebatê
Ew in berê gel diguhêzin rêya felatê

**Osman Sebrî**

– Tu jî kurtehelbestekê hilbijêre û binivîsîne:

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................





# BEŞA DUYEM

## Waneyên Beşê

- Em Welatê Xwe Nas bikin
- Tilhelef
- Gundê Mûriyan
- Şehîd Peyman
- Ala Rengîn

## Armancên Beşê

1. Naskirina dîrok û erdnîgariya welat.
2. Girîngiya welat di jiyana me de.
3. Danasîn û xurtkirina çanda berxwedanê.
4. Naskirin û hezkirina nirxên neteweyî.



# EM WELATÊ XWE NAS BIKIN









## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo tu xwezaya welatê xwe baş nas dikî?
2. Çima pêwîst e mirov welatê xwe nas bike?
3. Herêma ku tu li wê dijî, bi çi navdar e?
4. Li gorî te, hebûna av, çandinî, petrol û hwd, girîngiyekê didin welat û çawa?

Piştî ku mamoste li ser depê pirsa “girîngiya welatê me ya di cîhanê de çi ye?” nivîsî, li xwendekaran zivirî:

– Zarokên jîr, di vê waneyê de em ê welatê xwe û girîngiya wî nas bikin. Welatê me Kurdistan, herêmeke çiyayî ye. Bi çiyayên xwe yên bilind, geliyên kûr û deştên fireh navdar e.

Li ser vê pirsa ku hûn li ser depê dibînin, biaxivin.

Dîcleyê, destpêkê mafê axaftinê girt û wiha got:

– Welatê me Kurdistan cih û warê kurdistaniyan e welatekî dêrîn û xwedî bermahiyên dîrokî û dewlemendiyeke pir kevn e. Gelek caran ji mirovahiyê re malovanî kiriye. Xwediyê girîngyeke mezin e. Cihê çavkaniya pêşketina mirovahiyê ye. Ji ber vê, bala gelek şaristaniyên biyanî dikişîne.

Xebat mafê axaftinê girt û wiha peyivî:

– Lê, li gorî min girîngiya welatê me ji cihgirtina wî ya erdnîgariyê tê. Welatê me, dikeve parzemîna Asyayê. Li Rojhilata Navîn, di navbera parzemînên Asya, Ewropa û Efrîkayê de cih digire. Rêyên bazirganiyê yên girîng **“Hevrîşim û Biharatê”** tê re derbas dibin.

Kajînê jî mafê axaftinê girt û wiha dest bi axaftinê kir:

– Welatê me di warê xwezayî û dewlemendiyên sererd û binerd de jî xwediyê girîngiyeke mezin e. Ji binaxa welatê me, gelek cureyên kanzayî tên derxistin. Di warê av û rûbarên xwe de jî pir dewlemend e.



Wek: Dicle, Ferat, Zap û Aras. Her wiha di welatê me de du golên mezin “Wan û Ûrmiye” jî hene. Gelek cureyên çandinyê lê tên çandin weke: mêwe, zeytûn, genim, ceh, pembo û şinatî. Di warê lawirvaniyê de jî welatekî pir dewlemend e.

Piştî van gotinan, mamoste ji Çiya pirsî:

– Tu çi dizanî, Çiya?

Çiya jî wiha bersiva mamoste da:

– Hevalên min gelek tiştên xweş anîn ziman. Ji wan cudatir, girîngiya welatê me ji welatên cîran, di welatê me de gelek çavkaniyên petrolê hene. Petrol heyberekeke pir girîng e û em dikarin sûdê jê bigirin.

Piştî van gotinan, mamoste wiha peyivî:

– Hûn her bijîn! We gelek axaftinên girîng anîn ziman. Rast e, weke ku we jî anî ziman, li cîhanê welatê me Kurdistan, cihekî girîng digire. Ji ber vê yekê, çavên gelek hêzên dagirker li dewlemendiya welatê me ye.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Mamoste, çi pirs li ser depê nivisî?
2. Li gorî waneyê, Kurdistan bi çi navdar e?
3. Çima Kurdistan bala gelek şaristaniyên biyanî dikşîne?
4. Ji hêla erdnîgarî ve, Kurdistan  li ku cih digire?
5. Navên hin çem û golên Kurdistanê binivîsîne.
6. Kurdistan di warê çandiniyê de, welatekî çawa ye?
7. Çima çavên hêzên dagirker li welatê me ne?



# HÎNDARÎ

1. Em wateya peyva sorkirî hilbijêrin:

   a. Bi çiyayên xwe yên bilind, **geliyên** kûr û deştên fireh navdar e:

   (Çiya - Kanî - Çem û newal)

   b. Welatekî **dêrîn** û xwedî bermahiyên dîrokî û dewlemendiyeke pir kevn e:

   (Kevnar - Nûjen - Xwedî erk)

   c. Xebat mafê axaftinê girt û wiha **peyivî**:

   (Bêdeng ma - Axivî - Qîr kir)

2. Em ji waneyê hemwateya peyvên li jêr binivîsînin:

- **Siriştî**
- **Zengînî**
- **Jêder**

3. Em peyvên li jêr, di hevokên guncaw de bi kar bînin:

**Ferat - Dicle - Kurdistan**

## DERBIRÎN:

– Em jî di çarçoveya pirsên li jêr de, dabaşa herêma xwe bikin:

1. Cihê herêmê.
2. Dîroka herêmê.
3. Berhemên wê yên sererd û binerd.



## RÊZIMAN

1. **Mirov bi zanîn û sincê xwe tê nasîn; ne bi milk û mewdanê xwe.**
2. **Ji refa pêncem Serwer, Zîn û Kawa; ji refa şeşem Gulîstan, Rustem û Rokê bi ser ketin.**
   – Ev hêma (;) ji çi pêk tê?
   – Divê em çi navî li wê bikin?

## RÊGEZ:

Ev hêma dikeve navbera du hevokên ku ramanên wan ji nêz ve têkildar in û hev temama dikin.

## RAHÊNAN:

Xalbendiyan di cihên guncaw de, bi kar bînin:

– Bêhna gulan ji gulan tê bêhna mirovan ji mirovan tê.

– Ji bo tenduristiyê ji sebzeyan bacan û xes ji mêweyan pirteqal û sêv baş in.

– Hin mirov kar bi xemsarî dikin hinek mirov kar bi rijdî (cidî) dikin.



# TIL HELEF







## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Tu bajarê Serê Kaniyê nas dikî?
2. Wêneyên li jor çi diyar dikin?
3. Çi dîroka gel û welatan diyar dike?

Li Zanîngeha Rojavayê ya li bajarê Qamişloyê xwendekarek li ser maseyê rûniştîbû û pir ponijîbû, lewre bala Barînê kişand. Barînê mereq kir ku çima rewşa vê keça ku nû hatiye zanîngehê weha ye û her dem bi tenê rûdinê?

Barîn, di cih de ber bi keça ponijî ve çû, silav li wê kir û li gel rûnişt.

– Dem baş.
– Dem baş.
– Ez Barîn ji Qamişloyê me, beşa dîrokê dixwînim.
– Keça ponijî got:

Ez jî Evesta ji bajarê Serê Kaniyê me, beşa dîrokê dixwînim. Ez û malbata xwe nû hatine Qamişloyê.

– Barîn: Ez bi nasîna te, pir kêfxweş bûm! Lê her dem tu bi tenê rûdinî, gelo ev tenêtî, ji bo çi ye?
– Evestayê got: Ez ji bajarekî kevnar û dîrokî me, lê niha ez jê dûr im. Ji ber ku dagirkeran bajarê min dagir kiriye, çawa dê kêfxweş bibim?
– Barîn pirsî: Gelo kevnarbûna wê ji kengî de ye? Tu dikarî hindekî ji min re dabaşa bajarê xwe bikî?
– Evestayê bi serbilindî got:

Bajarê Serê Kaniyê, ji kevin de bi navê Xweşkanî dihat nasîn. Di dema hûrî û mîtaniyan de ku pêşîyên me kurdan in, navê wê bû Waşûkanî.



Çanda Tilhelefê di navbera salên (6.000 - 4.000 B.Z) de, lê pêş ketiye. Cara yekem çandinî bi rengekî birêkûpêk lê pêş ketiye. Lewre muhra xwe li dîroka mirovahiyê xistiye û weke destpêkirina çanda cotkarî û çandinîyê ye. Her weha bandoreke pir mezin li çandên derdora xwe jî kiriye.

Vedîtinên Çanda Tilhelefê pir in. Mîna: bivir, haletên cot, raçandin, hêrandin û hwd. Her wiha dîzik û xilik bi kar anîne. Xilikên Tilhelefê ji aliyê şêwe, cure û awayê biraştina wan, gihaştibûn asteke pêşketî û bi reng û wêneyên xwe, balkêş bûn. Rengên weke pirteqalî, qirmizî, sor, qehweyî û zer, bi kar dianîn. Her wiha dîzikên xwe ,bi şêweyên geometrickî (geyometrîkî ) û bi wêneyên mirov, lawir û şînatiyan dixemilandin.

– Barîn bi van agahiyan pir kêfxweş bû û ji Evestayê re got:

Ev rastiyên dîrokî ne û tu carî nayên veşartin.

– Evestayê got:

Ji berê de hemû berhemên bajarê min li muzexaneyên biyaniyan, bi cih bûne.

– Barînê got:

Giha tu carî di bin keviran de namîne! Dê ew roja ku tu li Serê Kaniyê vegerî bê û ez jî dê bibim mêvana te.

Evestayê bi gotina hevala xwe ya nû, pir şad bû û Barînê her dewam dikir:

Ji despêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, bajarê te armanca dagirkeran bû, lê bi saya zarokên agir û rojê, me Serê Kaniyê vegerand û ji ber ku vîna me her heye û rastî dê derkeve, dê rojeke din bê ku em li Serê Kaniyê vegerin, Evestayê spasiya Barînê kir û bi hev re derbasî semînera xwe bûn. Ji Barînê re him hêvî û him hevaleke nû çê bû.

## WATEYÊN PEYVAN:

**Ponijîn**: Hizirîn
**Raçandin**: Rêsîn
**Dîzik**: Şerbik
**Xilik**: zixur, kevirên biçûk
**Geyometrîkî**: endazeyî, hendesî
**Muzexane**: Kevnarxane

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çima Avesta her dem bi tena xwe rûdinişt?
2. Çanda Tilhelefê, li ku û di kîjan salê de hatiye vedîtin?
3. Navê çend alavên ku li Tilhelefê hatine vedîtin, binivîse.
4. Navên hin şûnwarên din ên rojavayê Kurdistanê binivîse.
5. Di nêrîna te de, gelo pêwîst e mirov şûnwarên welatê xwe nas bike û çima?

# HÎNDARÎ

1. Em bi hev re, van peyvên li jêr di hevokan de bi kar bînin:
   - **Şûnwar**
   - **Mîtanî**
   - **Bivir**
   - **Serê Kaniyê**
2. Em bi hev re, navên şûnwarên li jêr bigihînin herêma wan:

| | |
|---|---|
| • Xerab Reşk | • Rojhilatê Kurdistanê |
| • Keleha Semanê | • Rojavayê Kurdistanê |
| • Keleha Dimdimê | • Bakurê Kurdistanê |
| • Şkefta Şanîdarê | • Başûrê Kurdistanê |



## Derbirîn:

– Baş li wêneyên li jêr binêre û cihê dîrokî baş nas bike û çend xêzan derbarê wî de binivîse.





## RÊZIMAN

Di her hevokê de, hêmayên guncaw bi kar bîne:

– Celadet Bedirxan digot Yan fêrî zimanê xwe bibin, an nebêjin em kurd in

– Pêşiyên me dibêjin betalî xerabmalî

– Li lîstgehê Rêzan Dîlan Elend Hêvîn û Gulçîn dilîst

– Em bi lêkolîn, kar û xebatê bi ser dikevin lewra mamoste dibêje Lêkolîn û kar hev temam dikin

– Ew pir çîrokên xweş

– Dar bi xwedîkirinê mirov bi gotinê mezin dibe

## Rênivîs:

### Feqiyê Teyran


Feqiyê Teyran, helbestvanekî kurd e. Ew di sala 1549`an de li gundê Warezorê ji dayîk bûye. Ji ber ku gelekî li nav gel digeriya bi navê Feqiyê Gerok dihat nasîn. Gelek berhemên wî hene:


- Destana Zembîlfiroşê
- Destana Keleha Dimdimê
- Destana Şêxê Senaniyan

**Dilo rabe dilo rabe**
**Veke çavan ku êvar e**
**Nezan û bes di xew da be**
**Bi newmê re nebe yar e**

**Nivîsa li jor kurtejiyana Feqiyê Teyran e. Vê helbestê baş bixwîne û weke rênivîs binvîse.**

# GUNDÊ MÛRIYAN







## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Mûrî bi çi awayî kar dikin?
2. Mûrî li ku derê dijîn?
3. Mirov ji mûriyan fêrî çi dibe?
4. Çima mûrî xwarinê kom dikin?

Hebû nebû gundekî mûriyan hebû. Ev gund, pir xweş û şîrîn bû. Li vê derê mûrî hemû pir kêfxweş bûn û bi hev re heval bûn. Baxçeyê wan yê genim hebû, av û xwarina wan pir bû. Mûriyên vê derê her dem bi hev re kar dikir. Çanda xwe, bi başî û xweşî bi rê ve dibir.

Rojekê ji gundekî dûr hinek mûriyên mezin hatin gundê wan. Dema ku ev gundê pir xweş ku mûrî tê de bi şahî dijiyan, dît, xwest vî gundî ji wan bistînin. Ev mûriyên mezin û dirinde çûn gundê xwe bi hev re runiştin û hizirîn wê çawa vî gundê xweş ji mûriyên biçûk bistînin.

Mûriyên mezin got: “Em ê li gel gundê cîran bibin yek û biçin gundê van mûriyên biçûk bistînin û dagir bikin.” Piştî demekê xwe amede kir û ber bi gundê mûriyên biçûk ve çûn. Êrîşî gund kir, bi zordarî û hovîtiyê, ev gundê xweşik û şîrîn, talan kir. Wan xwest mûriyên azad ên vî gundî, tevan ji xwe re bikin kole.

Mûriyên vî gundî, tev pir xemgîn bûn û kêfxweşiya wan a berê nema bû. Baxçeyên wan hişk bûbûn û wan nema dikarîbû ji xwe re kar bike.

Mûriyên biçûk ji hev re got: “Wisan nabe, pêwist e em li ber xwe bidin û gundê xwe ji van mûriyên setemkar bistînin û wan rojên xwe yên xweş bizivrînin.”

Mûriyên biçûk civiyan, li ser pêkanîna vî karî li hev kir. Mûriyeke pir jîr got: “Tekane rêya serkeftinê, berxwedan e. Ji bo ku em bizivirin rojên xweş û bi aramî di gundê xwe de bijîn, divê em bi hev re li ber xwe bidin.” Ev nêrîn ji aliyê hemû mûriyan ve, hat pejirandin. Mûriyan, xwe baş amade kir, piştre dest bi berxwedanê kir.

Bi vî awayî, dijmin ji gundê xwe derxist, azadiya xwe pîroz kir û heya dawiyê di nava xweşiyê de jiyan.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Em waneyê bi baldarî û bê deng bixwînin, piştre binirxînin.
2. Ji waneyê, hevokeke ku bala te kêşaye, binivîse.
3. Rewşa mûriyên biçûk, beriya dagirkirina gundê wan û piştî dagirkirinê, çawa bû?
4. Te çi pend ji vê çîrokê girt?
5. Çanda berxwedanê divê çawa be?



# HÎNDARÎ

**1.** Em wateya peyva rengîn a rast hilbijêrin:

**a.** Mûriyan **çanda** xwe bi xweşî û başî bi rê ve dibir.

(Kultûr - Jiyan - Mal)

**b.** Mûriyên **dirinde** hizirîn ku gundê mûriyên biçûk bistînin.

(Kedî - Xweşik - Hov)

**c.** Em ê vî gundê xweşik **dagir** bikin.

(Ava - Ronî - Desteser)

**d.** Mûriyên biçûk biryar da ku gundê xwe ji **setemkaran** bistînin.

(Dost - Zordar - Zarok)

**2.** Em dijwateya pevên li jêr, bi alîkariya qertafên (ne-, bê-) saz bikin:

- **Xweş:**
- **Baş:**
- **Aramî:**

# RÊZIMAN

– Em valahiyên li jêr dagirin:

- Nexweşxane = **Nexweş** + **xane**
- Dermanxane = ........... + ..........
- Lîstikgeh = **Lîstik** + **geh**
- Amojgeh = .......... + .........
- Gulistan = ......... + .........
- Daristan = **Dar** + **istan**
- Derzîdank = **Derzî** + .........
- Guldank = ........... + ..........

– Peyvên li jor ji çi pêk hatine?

## RÊGEZ:

Navên pêkhatî: Ew navdêr in ku ji peyveke watedar û qertafeke sazker pêk tên.

- Em bi alîkariya qertafên li jêr, valahiyan dagirin û navan saz bikin:

**Geh - Ser - Istan - Van - Ber - Xane**

| | | |
|---|---|---|
| **Çap** | | **Çapxane** |
| **Gor** | | |
| **Aş** | | |
| **Jîn** | | |
| **Dad** | | **Dadgeh** |
| | **Mal** | **Bermal** |
| | | **Serkar** |



# ŞEHÎD PEYMAN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1.** Tu ji welatê xwe hez dikî?
**2.** Divê mirov çawa parastina welatê xwe bike?
**3.** Çima kesê ku ji bo welat kar dike, tê hezkirin?
**4.** Kesên ku canê xwe fedayî welatê xwe dikin, em çi navî li wan dikin?

# Şehîd Peyman

Girêdana mirov bi jiyanê ve tiştekî gelekî seyr e. Di nava vê jiyanê de, mirov herî zêde bi dayîk, bav, xwşik, bira, heval û xizmên xwe ve, tê girêdan. Dibe ku ev girêdan, girêdayî jîngeha ku lê mezin bûye û vehesîn û rehetiya ku lê dibîne. Tiştê ku mirov, dayîk, bav heval, xizim û jîngeha ku tê de dijîn, dihundirîne, xaka welat e. Lewra welat weke dayîkeke dilovan ji hemûyan re, tê hesêb.

Ev welatê dilovan, bi damarên xwe, giyan û gewdeyê me tîmar dike. Ji ber vê yekê, dûrbûna ji welat tê wateya tunebûn û tenêtiyê.
Kesên ku li vê yekê serwext dibin ji bo welatê xwe, tiştên herî binirix û pîroz dikin.

Ji bo welat û parastina wî ji neyaran, gelek cangorî û pakrewanan berdêlên pir giran û buha, dane.
Yek ji wan lehengan keça Amûda rengîn, Şehîd Peyman e. Şehîd Peyman, çavên xwe li bajarê Amûdê, warê rewşenbîran, li jiyanê vedike. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî, bi rengekî serkfetî li dibistanên Amûdê diqedîne. Bi destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, tev li pêngavên guhartinê dibe.

Şehîd Peyman, gava destpêkê tev li xebatên perwerdeyê dibe û li Navenda Reşîdê Kurd, fêrî zimanê kurdî dibe. Paşê vî karî li pêş dixe. Ew jî mîna Viyan Amara û Leyla Qasim, xebatên girêdayî zanîn û perwerdeyê, pêşkêşî welatê xwe dike. Ew dibe xemxura fêrbûna zarokên welatê xwe û ji bo vê yekê têdikoşe.

Paşê li Efrînê tev li kar û barên raghandinê dibe û xebatên pir binirix ji bo çapemeniya azad dike. Şehîd Peyman, di sala 2014`an de, ji bo parastina xaka rojavayê Kurdistanê, jiyana xwe ji dest da û tev li karwanê nemiran bû.

## Wateyên Peyvan:

**Seyr:** ecêb, sosret

**Jîngh:** Derdor

**Xizim:** Meriv

**Vehesîn:** Rehetî

**Serwext:** Têghiştin

**Tîmar:** Xwedîkirin

**Cangorî:** Canfida

**Pakrewan:** Şehîd

**Leheng:** Qehreman

# GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Mirov herî zêde, bi çi ve girêdayî ye?
2. Çima welat weke dayîkeke dilovan tê dîtin?
3. Li gorî te welat tê çi wateyê?
4. Rola şehîd Peyman di civakê de, binirxîne.
5. Li gorî nêrîna te, çima şehîd Peyman di milê perwerdeyê de, kar dikir?
6. Navên çend cangoriyên ku xebat ji bo welat kirine, binivîse.



# HÎNDARÎ

1. Em ji nav vebijêrkên li jêr, wateya peyva sorkirî hilbijêrin:

   a. Welat, dareke xweşik û **bedew** e:

   (Ciwan - Nexweşik - Nenas)

   b. Welatê min, bedewiya te, **hevrikiyê** bi bedewbûna heyvê re dike.

   (Pêşbazî - Dijberî - Cudahî)

   c. Hezkirina welat, bi kar, **ked** û xebatê ve girêdayî ye.

   (Xemsarî - Çalakî - Dûrketin)

2. Em van hevokên li jêr sergihayî bikin:

– Girêdana mirov bi jiyanê ve ..................................

– Ev welatê dilovan, bi ..........................................

– Kesên ku li vê yekê serwext .................................



**Derbirîn:**

Tê bîra min, di dibistanê de, ji me dipirsîn: “Du zêdekî duyan, çi qas e?”. Hemû xwendekaran digotin: “Çar e”, lê ez di bersivê de bibin diketim, ji ber ku min bawer dikir ku yek e, ne çar e. Min bawer dikir ku diran, her du lêv û ziman nabin çar, lê dibin dev û qîr dike.

Min bawer dikir ku her du dest û her du ling, nabin çar, lê dibin gewde û bi hev re di laşekî de, kar dikin.

Min bawer dikir ku tax, mal, kolan û rê nabin çar, ew dibin bajarek, xizan û dewlemendan dihundirîne. Min bawer dikir, ku reh, qurm, pel û şax nabin çar, ew dibin daristanek ku darên biçûk û mezin dihundirîne.

Min bawer dikir ku hezkirin, dildarî, xweşikbûn, dilpaqijî nabin çar, ew dibin dilbera dildarekî. Gelek mînakên wisa hene û nayên jimartin. Tiştê ku ez dizanim, heke min topbaran bikin û bikujin û bikin sed parçe, tiştê di dilê min de, li ser zimanê min e “Kurdistan yeke, nabe çar parçe”.

– Ev gotina li jor a Pêşewa Qazî Mihemed e. Ji bo gel, canê xwe gorî kiriye. Tu jî derbarê pêşengekî kurdan de ku canê xwe feda kiriye, binivîse.

# RÊZIMAN

## PÊŞGIRÊN NAVDÊRSAZ

– Peyvên li jêr ji çi pêk hatine:

- Berbang.......... + ..........
- Berçavk ......... + ..........
- Bermal ........... + ..........
- Derdor ........... + ..........
- Serdar ............ + ..........
- Sernûçe .......... + ..........

Ev pêşgir (ber - ser - der ...) bi navan ve vedibin û navên nû çêdikin.

– Em ji nav û qertafên li jêr, navên nû çêbikin:

- Ber + kevir ...............
- Ser + gotar ...............
- Der + birîn ...............
- Ser + mil ...............



# ALA RENGÎN



## Ala Serhildana Agirî

Min divê her tu bilind bî
Ala rengîn kesk û zer
Him xweşî him ceng û rûmet
Tên zanîn ji sor û gewr
Dûr nêzîk ez ê te hildim
Tu yî xemla banê min
Ger bivê derman mirin bî
Bo te gorî canê min
Her çî xort in her çî kurd in
Bo te lavjan dibêjin
Leşker im bo te ala min
Min divê gurmîn û şer

**(Osman Sebrî)**



## WATEYÊN PEYVAN:

**Ceng**: Şer

**Rûmet**: keramet, nirx

**Xeml**: ciwanî, rengînî

**Gorî**: qurbanî, fîda

**Lavij**: Stran

## Em helbestvanê xwe nas bikin



Apê Osman Sebrî, di sala 1905`an li gundê Narinceyê yê bakurê Kurdistanê, ji dayîk bûye. Ji ber stema dewleta Tirkiyê derbasî rojavayê Kurdistanê dibe û li Şama paytexta Sûriyeyê niştecih dibe.

Ji bo gelê kurd û mafê wî, gelek xebatên ramiyarî û wêjeyî kirine. Di sala 1993`yan de li Şamê, koça dawî kiriye û li Berkevira girêdayî Dirbêsiyê, hatiye oxirkirin.

## Hin Berhemên wî:

1. Çar Leheng
2. Elfabeya Kurdî
3. Dîwana Bahoz
4. Dîwana Apo
5. Pirtûka Lêkolînê li ser Ziman û Rêzimana Kurdî

# GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Helbestvan, di helbestê de dabaşa çi dike?
2. Di malika pênc û şeşan de, Osman Sebrî daxwaza çi dike?
3. Serenavekî nû ji helbestê re, binivîse.
4. Tu jî navê çend helbestvanên kurd binivîse.
5. Xêza heştan ji helbestê, hestekî çawa dide der?
6. Bi alîkariya mamosteya/ê xwe, malika li jêr şîrove bike:

Him xweşî him ceng û rûmet
Tên zanîn ji sor û gewr

## AGAHIYÊN WÊJEYÎ

Helbest, ji xêzik û malikan pêk tê:

| | | |
|---|---|---|
| **Min divê her tu bilind bî** | **Xêz** | Malik |
| **Ala rengîn kesk û zer** | **Xêz** | |
| **Him xweşî him ceng û rûmet** | **Xêz** | Malik |
| **Tên zanîn ji sor û gewr** | **Xêz** | |

– Tu jî helbestekê hilbijêre û binivîse, tê de xêzik û malikan destnîşan bike.





# BEŞA SÊYEM

## Waneyên Beşê

- Elektrîk
- Enternet
- Endazyar
- Stêrk

## Armancên Beşê

1. Girîngiya elektrîkê, sûd û metirsiyên wê.
2. Girîngiya enternetê û sûdên wê.
3. Naskirina hêlên neynî yên enternetê.
4. Naskirina girîngiya endazyariyê û sûdên wê li civakê.

# ELEKTRÎK



**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

**1. Ev amûrên di wêneyan de, bi rêya çi, dixebitin?**
**2. Ev amûr, di jiyana me de, çi rolê dilîzin?**
**3. Di roja me ya îro de, gelo em dikarin xwe ji van amûran qut bikin û çima?**

Dem şev bû, malbat hemû li hev civiya bû û li televîzyonê temaşe dikir. Ji nişka ve, elektrîk qut bû, televîzyon, lempe û hemû amûrên hundir ên ku li ser elektrîkê dixebitin, vemirîn.

Bav, xwest vê derfetê bigire û ji zarokên xwe re li ser elektrîkê biaxive.

Bav: “Binêrin zarokino, di jiyana me de, elektrîk tiştekî pir girîng e. Li mal, nexweşxane, kolan, kargeh û hemû deverên din, pêwîstiya me bi elektrîkê heye. Hemû amûrên malê mîna: avsark, cilşo, utî û perwane bi elektrîkê dixebitin. Bijîşk, bêyî elektrîkê nikarin nûjdariyan çêbikin, ji ber ku hemû amûrên ku bi kar tînin, bi elektrîkê dixebitin. Di kargehan de, piraniya amûran bi elektrîkê dixebitin. Dema ku elektrîk qut dibe, kar jî radiweste. Her weha, li kolanan jî dema ku bi şev qut dibe, astengî di çûn û hatinê de, derdikevin.

Piştî vê axaftinê, bav ev pirs ji zarokan kir:

– Dema ku elektrîk hefteyekê qut bibe, dê çi bandorê bike?

Zarokan gelek bersiv dan, hin ji van bersivan derbarê rawestîn û nexebitîna kargeh, sazî û nexweşxaneyan de bû. Her weha, zarokan, dabaşa germa havînê jî kir. Ji ber ku amûrên sarkirinê yên mirovan ji germê diparêzin, ew jî bi elektrîkê dixebitin.



Lê bersiva herî balkêş a Xelatê bû:

– Dema ku elektrîk qut dibe, endamên malbatê li hev dicivin û gelek mijaran bi hev re guftûgo dikin û demeke xweş bi hev re derbas dikin.

Piştî bav nas kir ku zarokên wî baş fêrî girîngiya elektrîkê bûn, weha got:

– Baş e zarokino, lê divê em ji bîr nekin, tevî ku sûdên elektrîkê hene, her weha metirsiyên wê jî hene. Divê em zanibin çawa elektrîkê bi kar bînin û xwe ji wê biparêzin û ji bo civak hemû sûdê ji elektrîkê wergire, pêwîst e her malbat û sazî elektrîkê li gorî pêwîstiya xwe bi karbînin û hemû amûrên zêde û nepêwîst vêxistî nehêlin.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çima elektrîk di jiyana me de, tiştekî girîng e?
2. Ji bilî yên ku di nivîsê de, navên çend amûrên ku bi elektrîkê dixebitin, binivîse.
3. Serenavekî nû ji nivîsê re hilbijêre.
4. Sûdên elektrîkê û metirsiyên wê bi mamoste û hevalên xwe re, guftûgo bike.
5. Ji bo ku hemû civak sûdê ji elektrîkê wergire, pêwîst e em çi bikin?

# HÎNDARÎ

**1.** Em gotinê bigihînin wateya wê:

- **Derfet**
- **Girîng**
- **Guftûgo**
- **Kargeh**

- **Danûstandin**
- **Pêwîst**
- **Cihê kar**
- **Delîve**

**2.** Em dijberên van peyvan binivîsin:

– Germ .................
– Vemirî .................
– Pir .................
– Axaftin .................

**3.** Em hevokên li jêr sergihayî bikin:

– Dema ku elektrîk qut dibe, ............................
– Dema ku buhar tê, ............................
– Dema ku em li dapîra xwe kom dibin, .................



## DERBIRÎN:

Gelek zanyaran raje ji cîhanê re kirine û bi afrîneriya xwe civaka me li pêş xistiye û ronî kiriye. Mînak: Thomas Alva Edison (Tomas Alva Edîson). Di dema me ya niha de, ew mîna çirayên geş xuya ne, lê hin kesayetan rajeyên binirx kirine û mafê wan ê navdarbûnê wenda bûye. Mîna Nikola Tesla (Nîkola Têsla). Gelo tu vî zanyarî nas dikî? Mijareke kurt derbarê wî de, binivîse.

## RÊZIMAN

– Peyvên li jêr ji çi pêk hatine:

- Darik = Dar + ik
- Oldar = .......... + ..........
- Navdêr = .......... + ..........
- Solbend = .......... + ..........
- Nalbend = .......... + ..........

## RÊGEZ:

Paşgir (ik, dar, dêr, bend), ji navan, hin navên cuda çêdikin.

– Em valahiyên li jêr, bi nav û qertafên guncaw dagirin:

**a.** Dil + .......... = Dildar

**b.** ........... + dar = ..........

**c.** ........... + .......... = ..........

**d.** Saz + .......... = Sazbend

**e.** .......... + .......... = Çavdêr

**f.** Reng + .......... = ..........

**g.** Berx + .......... = ..........

**h.** ..........+ ik = ..........



# ENTERNÊT



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1.** Amûrên di van wêneyan de, ji bo çi tên bikaranîn?

**2.** Mirov, çawa bi xizmên xwe yên dûr re diaxive?

**3.** Ragihandin di roja me ya îro de, bi rêya çi pêk tê?

**4.** Di roja me ya îro de, mirov çawa dikare agahiyan bi hêsanî bi dest bixe û xwe li pêş bixe?

Enternêt, di jiyana me ya îro de, bûye beşekî pir girîng. Enternêt, bandoreke pir xurt li jiyana me ya zanistî, çandî û civakî dike. Bi saya enternêtê, cîhan bûye mîna gundekî biçûk, ji ber ku em kê bixwazin, em dikarin di navbera xulekekê yan du xulekan de, yekser wan bibînin û dengê wan bibihîzin.

Toreya enternêtê heta niha, yek ji baştirîn afrîneriyên mirovan tê dîtin, ji ber ku gelek raje ji mirovahiyê re pêşkêş kiriye. Enternêt, wekî ku tê zanîn, toreyeke cîhanî ye, ji bo ku hemû amûrên mîna kompûter, mobile, televizyon û hwd, li hemû deverên cîhanê bi hev ve girê bide û agahî di navbera wan de bên veguhestin, enternêt xetên telefon, satlayt û gihanekên bêtêl, bi kar tîne.

Enternêt, cara yekemîn di sala 1969`an de, li Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê hat bikaranîn. Armanca wê, ew bû ku girêdanek di navbera zanîngehan de çêbibe û bi hêsanî zanîngeh peywendiyê bi hev re bikin.

Bi saya enternêtê, êdî hemû agahî û zanist peyda dibin û di hemû qadên zanistî, stêrknasî, peywendî, bijîşkî, endazyarî, bazirganî, nûçe û hwd de, em dikarin sûdê ji wê wergirin.



Bi rêya enternêtê, mirov dikare ramanên xwe bi rengê wêne, vîdyo, deng û nivîsê bi hêsanî û lez biweşîne û peywendiyê yekser bi rêya deng û wêne bi xizmên xwe yên dûr re çêbike. Lewra bi sa ya enternetê dem, ked û dûrahî tên kurtkirin.

Lê divê em ji bîr nekin ku tevî erênî û sûdên enternêtê hene, her weha neynî û ziyanên wê jî hene.

Gelek malperên enternêtê yên ku gendelî û nûçeyên derewîn ên ku mirovan diajon ser jihevnefretbûyîn û tundiyê diweşînin hene. Her weha, qedandina demeke dirêj li ser enternêtê dihêle ku mirov ji gelek hêlên civakî û malbatî ve, xemsar bibe. Ji hêla tenduristî ve û mayîna demeke dirêj li ser enternetê û tevgera kêm, bandoreke neyînî û ziyanê digihîne çav, pişt û pergala laş bi giştî. Lewre, dema ku em enternêtê bi rengekî şaş û çewt bi kar bînin, ji bilî ziyanê, em tiştekî din ji wê wernagirin.

# GUFTÛGOYA WANEYÊ

**1.** Çima bi saya enternêtê, cîhan bûye mîna gundekî biçûk?

**2.** Enternêt yekemîn car di kîjan salê de, li ku derê û ji bo çi hat bikaranîn?

**3.** Enternêt bi rêya çi xwe digihîne, hemû deverên cîhanê?

**4.** Ziyanên enternêtê, bi mamost re guftûgo bike?

**5.** Tu çawa û ji bo çi, enternêtê bi kar tînî?

## HÎNDARÎ

**1.** Em her peyvek ji peyvên li jêr, bigihînin wateya wê:

- Afrînerî
- Satlayt
- Peywendî
- Metirsî
- Gendelî
- Xemsar
- Malper

- Ziyanên kesekî yan tiştekî
- Kesê ku baş bi erkê xwe ranabe
- Çêkirina tiştekî nû
- Peykên asîmanî
- Rûpelên Enternetê.
- Têkilî
- Kirina karên xerab

**2.** Em her peyveke ji van peyvên li jêr, di hevokekê de bi kar bînin:

**Bihîstin - Agahî - Nûçe - Zanist**

# RÊZIMAN

## HEVALKARÊN DEMÊ:

Di hevokên li jêr de, dema kar destnîşan bikin:

- Ez duh çûm gund.
- Ew piştî mehekê dê zeviya xwe cot bike.
- Zarok sibehê taştê xwar

Em dikarin çi navî li van gotinan (duh, piştî mehekê, sibehê), bikin?

## RÊGEZ

Peyvên ku dema kar destnîşan dikin, hevalkarên demê ne.

1. Em cihên vala bi hevalkarên demê dagirin:
   - Ew .......... hat û dê..........biçe.
   - Peywan .......... waneyên xwe dinivîse.
   - Amed ............ çû mala dapîra xwe.
   - Ji ........... û pê de, stêrk baş xuya dikin.

# ENDAZYAR





## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Tu di her wêneyekî de çi dibînî?
2. Kesên karnas di avakirina avahiyan de, çi ji wan re tê gotin?
3. Çima pêwîst e em her dem karê xwe bi rêkûpêk bikin?

Apê min Azad, endazyarekî pir jîr, jêhatî û serkeftî ye û ji karê xwe pir hez dike. Ew di warê çakirin û plankirina avahî, pir, sûr û tiştên mîna wan de dixebite.

Karê endazyariyê karekî pir xweş e û kêfa min ji wî re tê, lewra ez dixwazim dema ku mezin bibim, di jiyana xwe de vî karî bikim û di warê avakirina avahiyên mîna nexweşxane û dibistanan de rajeyê ji welatê xwe re bikim. Her dem ez li belgefilmên derbarê endazyariyê de, temaşe dikim. Di encama şopandina min a ji karê endazyariyê re, min gelek agahî bi dest xistine.

Endazyarî, huner û zanisteke ku ji demên pir kevin de heye. Di dema me ya niha de jî gelek şax û beşên endazyariyê hene û her beşek ji van beşan, girîngiyeke wê heye.

Endazyarê avahîsaz, roleke wî di avakirin û pilankirina avahiyên herî baş û guncaw de heye. Her weha, endazyarê elektronîkan jî roleke wî di lipêşxistina teknolojiya nûjen û endazyariya peywendiyan de heye. Endazyarê çandiniyê jî roleke wî di hilbijartina cureyên çandiniyê yên ku berhemeke baş û bilind ji welat re tînin, heye. Her weha, parastina dar û şînatiyan ji hemû nexweşî û qirêjiyan dike. Ev yek jî sûdeke mezin digihîne mirov û jîngehê.

Endazyar, ew kesê ji civakê yê ku roleke wî ya girîng di geşpêdan û bipêşxistina welatê wî de heye. Divê endazyar her dem berjewendiyên welatê xwe, di ser berjewendiyên xwe yên taybet re bigire. Pirojeyên girêdayî bilindkirina asta derfetên welatê xwe, plan bike û pêk bîne.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Navê pîşeya Azad çi ye û ew miroviekî çawa ye?
2. Endazyarî, karekî çawa ye û ji kengî de heye?
3. Ji bilî yên di deqê de, navê çend beşên din ên endazyariyê binivîse.
4. Çi erka endazyar li hember welatê wî heye?

# HÎNDARÎ

1. Em gotinên li jêr,  di hevokan de bi kar bînin:

**Lipêşxistin - Pêşeroj - Pêkanîn**

2. Wateya peyva (avakirin) di hevokên li jêr de diyar bike:

– Karê mamoste, avakirina mirovan e. (..........)

– Ji bo avakirina welatê xwe, pêwîst e em kar bikin. (..........)

– Min xaniyek ji xwe re ava kir. (..........)

3. Em her peyvekê ji peyvên li jêr bigihînin wateya wê:

- Çakirin
- Plan
- Belgefilim
- Guncaw
- Nûjen
- Geşpêdan
- Berjewendî

- Bikêrhatî
- Sûdgirtina ji tiştan.
- Tiştên ku li gorî teknîka nû tên çêkirin.
- Sererastkirin, sazkirin
- lipêşxistin
- Filmên ku rastiyê nîşan didin.
- Bername yan nexşeya ku berî kirina karekî, tê danîn.



## DERBIRÎN:

Xerab Reşkê: Şûnwarekî kurdan e û dîroka wê vedigere 12000 sal B.Z. Li bakurê Kurdistanê, li bajarê Ruhayê hatiye vedîtin.

Di çarçoveya van pirsên li jêr de, mijareke kurt binivîse:

1. Gelo wêneyên ku li Xerab Reşkê hatine dîtin, çi ji me re diyar dikin?
2. Gelo, peristgeha wê, bi çi awayî hatiye avakirin?
3. Kevirên di Xerab Reşkê de, hatine dîtin, qaseya wan çi qas e û bi çi rêbazêa endazyarî hatine dayîn?



## RÊZIMAN

# HEVALKARÊN CIH

1. Ev bûyerên li jêr, li ku rû dane:
   - Ew li malê kar dike.
   - Li Kurdistanê, gelek şoreşan, rû daye.
   - Sibê dê Lezgîn biçe zanîngehê.

(mal, Kurdistan, zanîngeh) hevalkarên cih in.

## RÊGEZ:

Hevalkarên Cih: Cihê ku kar li wî rû dide, destnîşan dikin.

Cihên vala bi hevalkarên cih dagirin:

- Lîstikvanan li .......... lîst.
- Dema dijminan êrîşî .............. kir, şoreşvanan li ber xwe da.
- .......... cihê daran e, ............... cihê mûriyan e.
- Mirovên destpêkê, di .......... de dijiyan.



# STÊRK



Dema salê payîz bû
Şevek pir qar û zîz bû
Ez razabûm li ser ban
Min dinêrî li ezman
Ezman safî û kerr bû
Hemî şewq û fener bû
Çendî bi xeml û xêz in
Belawela û rêz in
Hemî nexş û nîgar in
Bi her rengî diyar in
Hin mezin hin piçûk in
Eynî zerî û bûk in
Hin ji wana kevir in
Hin ji wana agir in
Pêwan û qelawiz in
Ruhnya hev du didizin
Şewqê ji hev distînin
Ji dûr ve diçrisînin
Hin ji wana nîşan in
Bi tevger û dewran in
Hin ji wana duqrijin
Têne xwarê, dirijin
Li ezmana bela ne
Rengê çirê mala ne

**(Salihê Heydo)**

## WATEYÊN PEYVAN:

**Qar**: Reşê herî tarî.

**Zîz û kerr**: Bêdeng

**Fener**: Fanos

**Zerî**: Keç

**Pêwan û Qelawiz**: Zêrevan

**Duqrijin**: Dema ku şewqa tiştekî hêdî hêdî kêm dibe û vedimire.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Mijara helbestê çi ye?
2. Ezman çawa bû?
3. Qebareya stêrkan çawa bû?
4. Helbestvan stêrkên biçûk û mezin, mîna çi dibîne?
5. Li gorî helbestvan, stêrk ji çi pêk tên?
6. Ji helbestê, malika ku bala te kêşaye, binivîse.
7. Bi alîkariya mamosteya/ê xwe, van her du xêzan şîrove bike:

**“Hin ji wana duqrijin**
**Têne xwarê dirijin”**



## Rênivîs:

**Melayê Cizîrî:**

Li Cizîra Botanê di sala 1570yî de ji dayîk bûye.

Li pey xwe dîwaneke helbestan bi navê Eqid Elcewherî hiştîye.

**Hindî ku digazehim dikêşim sebr û xîretê**
**Şubhetê çeng û jeh im hilakim j` derba tîrê**
**Senaxwanê Feqeh im îroke di Cizîrê**

**Ev helbesta li jor a Melayê Cizîrî ye, weke name ji Feqiyê Teyran re, rê kiriye, wê baş bixwîne û weke rênivîs binvîse.**



# BEŞA ÇAREM

## Waneyên Beşê

- Mamê Hesinkar
- Cotkar
- Bijîşkî
- Dirûnkar
- Nanpêj

## Armancên Beşê

1. Naskirina pîşeya hesinkariyê û tiştên girêdayî wê.
2. Naskirina karê cotkariyê û alavên wê yên kevin û nû û sûdên wê.
3. Naskirina pîşeya dirûnkariyê û cilên kurdî yên folklorî.
4. Naskirina rol û girîngiya karê bijîşkiyê.



# MAMÊ HESINKAR



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Navên van amûrên di wêneyan de binivîse.
2. Navên çend tiştên ku ji hesin çêdibin, binivîse.
3. Kesê ku di hesin de dixebite, em çi navî li wî dikin?

Li taxa me hesinkarek heye. Ev hesinkar di dikaneke biçûk û tijî alavên cuda de, dixebite. Rojekê min parçeyekî hesinî bir gel wî. Min dixwest wî parçeyî ji min re parçîm bike. Min silav lê kir û daxwaza xwe jê re got.

Bi rûkenî ji destê min girt û got: "Ser çavên min Hogirê delal". Wî dest bi kar kir û min jî vehesînek dît û hin pirs jê kirin:

– Mamê hesinkar, tu ji kengî ve, vê pîşeyê dikî?
– Mamê hesinkar: Di temenê sîpetiyê de, min ev pîşe ji bavê xwe girt.

Min mereq kir, ji kengî ve ev pîşeya hesinkariyê heye?

– Mamê hesinkar: Bi dîtina mirov ji hesin re, mirov hewl daye ji reqbûna wî sûdê wergire. Destpêkê alavine seretayî mîna kêr, sênî, balte jê çêkiriye û paşê li gorî pêwistiyê, ev pîşe li pêş xistiye. Mînak: das, qeynax, gîsin, tekerên erebeyan jî jê çêdikirin.

Li dikana mamê hesinkar hin alavên ku bi wan kar dike, hebûn. Lê min navê wan nizanîbû, lewra min pirsî:

– Navên van alavan çi ne?
– Mamê hesinkar: Ev kûre ye. Di rêya wê re, em hesin sor dikin heta ku hesin digihêje asta nermbûnê. Ev hesinê pan navê wî sindan e. Li ser sindan hesinên sorkirî bi cih dibin û alav jê çêdibin.

Her wiha hin alavên nûjen jî li dikanê hebûn. Mîna hesinbir, çerx, alava lehîmê bireka hesinî, mivred.

Min pirsî: Ev derî û pencere te çêkirine?

– Mamê hesinkar: Em derî, pencere, sarincên hesinî, textên hesinî û hwd ji pêwistiyên civakî ji hesinê xam, çêdikin.

Di dawiyê de, min spasiya mamê hesinkar li ser palçîmkirina parçeyê hesinî û agahiyên dewlemend ku ji min re gotin, kir.

## WATEYÊN PEYVAN

**Sîpe**: Nûhatî

**Pîşe**: Hokar

**Req**: Hişk

**Balte**: Amûrê ku dar pê tê birîn.

**Teker**: dolab, çerx

**Kûre**: êtûn, firin

**Sindan**: Amûreke giran e; hesinkar bi kar tîne.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Hesinkar li ku dixebite?
2. Çima Hogir çû gel mamê Hesinkar?
3. Mamê hesinkar ji kê fêr bûye?
4. Çima mirov hesin bi kar aniye?
5. Despêkê mirov çi alav ji hesin çêkirine?
6. Navên alavên hesinkariyê çi ne?
7. Tu jî hin alavên ku hesinkar bi kar tine, binivîs.

## HÎNDARÎ


Em li hember her peyvekê dijwateya wê binivîsin:


| WATE | DIJWATE |
| --- | --- |
| Dixebite | |
| Rûkenî | |
| Girtî | |
| Sûd | |
| Sorkirin | |



## DERBIRÎN:

Baş li wêneyên li jêr temaşe bike û mijarekê li ser pêvajoya çêkirina derî binivîse.







## RÊZIMAN

### LÊVEGER

**1. Em bi alîkariya qertafên li jêr, valahiyan dagirin û peyvên nû saz bikin:**

**(Geh - Xane - Dank - Ser - Ik - Ber)**

– Xwê .......... li ser maseyê ye.

– Li zanîn.......... û peyman.........., pir xwendekar hene.

– Em ji derman.......... derman dikirin.

– Min ..........gotarek xwend, ew pir xweş bû.

– Min ..........çavk da ber çavên xwe.

– Wî dar.......... şkand, lê ew pir hişk bû.

**2. Em bi hev re, valahiyên li jêr bi hevalkarên guncaw dagirin:**

– Ew .......... paqij dike.

– Ev .......... em li benda te ne.

– Ew her roj diçe ...........

– Li ser .......... gelek kevirên mezin hene.



# COTKAR





## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Kesê mijûlî karê zevî û daran dibe, em çi navî lê dikin?
2. Çi sûda zevî û daran ji bo mirovan heye?
3. Demên berê, zevî çawa dihatin cotkirin?
4. Alava berê ya cot, navê wê çi bû?
5. Di dema niha de, cot çawa tê kirin?

Duh bapîrê min ji gund hatibû, ew li gund dijî û temenê wî nêzî 60 salî ye. Di çavên wî de, hezkirina jiyana gundan û xwezayê xuya ye. Bavê min ji wî pirsî:“Bavo, we zeviyên xwe cot kirine?”

Bapîr:

Erê, ji destpêka payîzê de, me zeviyên xwe bi terektorê, cot kirine.

Bapîrê min zivirî ser me û got: “Demên berê me zeviyên xwe bi rêya halet û dewaran cot dikirin. Belkî Nalîn û Bawer bipirsin halet, çi ye?” Xwişka min Nalînê got:“-Belê, min meraq kir bapîrê min, halet çi ye?”

– Halet, alaveke çandiniyê ye. Bi rêya wê, cotkar zeviyên xwe cot dikirin. Halet bi rêya du hespan an du gayan tê kêşan. Serê wî hesin e; em ji wî re dibêjin gîsin. Me zeviyên xwe bi rêya wî cot dikirin. Dema ku nîvro dibû, me her du ga radiwestandin û halet ji wan vedikir, me ga bi êm û av dikirin. Her weha, cotkar jî firavîna xwe dixwar û demekê xwe vedihesand. Di pey re, cotkar cardin heta êvarî cotê xwe dikir. Ji ber vî rêbazê klasîk, di cotkariyê de rûberên çandiniyê ne ewqas pir bûn, lê niha teknîk li pêş ketiye û alavên nûjen ên mîna terektorê tên bikaranîn. Bi sedema van alavan, rûberên çandiniyê jî pir bûne.



Cotkar, di demên bûrî û niha de, sûdê dide civakê, berhemên mîna genim, ceh, nîsk, kemûn, pîvaz, pembo û hwd pêşkêş dike.

Bavê min got: “Rast e, di rêya cotkar re, em dikarin li bajaran xwarinên xwe bi dest bixin. Her weha cotkar, xwezayê bi çandina dar, şînatî û dexilûdanan dixemilîne û jîngehê ji qirêjiyên kargehan baqij dike.”

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Bavê Nalînê, çi pirs ji bapîrê wê kir?
2. Kengî zevî tên cotkirin?
3. Nalînê, çi pirs ji bapîrê xwe kir?
4. Halet, bi rêya çi dihat kêşan?
5. Cotkar, çi sûdê dide civakê?
6. Navên hin berhemên çandiniyê bibêje.
7. Çima rûbera zeviyên cotkar zêde bûye?
8. Hin taybetiyên mirovê cotkar binivîse.
9. Pendeke pêşiyan a girêdayî cotkariyê bibêje.



# HÎNDARÎ

**1.** Em wateyên peyvên li jêr binivîsin:

– Dewar:

– Halet:

– Zevî:

– Rûber:

– Cot:

**2.** Em bi hev re, valahiyên li jêr dagirin:

– Demên berê me .......... xwe, bi rêya halet û .......... cot dikirin.

– Halet, bi rêya du hespan .......... du gayan, tê ..........

– .......... wî hesin e, em ji wî re dibêjin .......... .

– Dema ku nîvro dibû, me ga .......... û halet ji .......... vedikirin.

**3. Em û mamoste bi hev re, gotinên watedar (Gotinên Pêşiyan) sergihayî bikin:**

- Ceh zer bûn ji ser bark
- Alîkarî
- Bitrî
- Betalî

- êşê sivik dike.
- lê ku genim zer bû dasa xwe rak.
- xerab malî.
- ji gayê cot re namîne.

**4.** Gotinên li jêr, di hevokên guncaw de bi kar bînin:

**Gîsin - Cot - Terektor - Alav - Ga**

# RÊZIMAN

## DEMA NIHA

- Ew diçe kargehê.
- Ew her roj, pirtûkên nû dixwîne.
- Memo, gelek firinde û balindeyan dibîne.

Karên "çûn, xwendin û dîtin" di kîjan demê de çêbûne?

| Dema Niha | Dema Bûrî | Dema Bê |
|---|---|---|
| | | |

## RÊGEZ:

Ji kar û tevgerên ku di dema vegotinê de tên kirin re,"dema niha" tê gotin.



– Em bi hev re, li gorî tabloyê, lêkeran di dema niha de, bikşînin:

| Lêker | Dema Niha |
|---|---|
| Lîstin | Dilîzim |
| Kolan | |
| Bezîn | |
| Temaşekirin | |

– Em bi hev re lêkerên di kevanê de, di dema niha de bikşînin:

Em li dibistanê pirtûkan ................... (Xwendin)

Ew hevalên xwe bi karên baş ................ (Mijûlkirin)

Ez barên giran ................. (Rakirin)



# BIJÎŞKÎ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Dema mirov nexweş dikeve, kî wî derman dike?
2. Ji bo tenduristiyeke saxlem, pêwîstî bi çi heye?
3. Tu ji bijîşkan hez dikî û çima?

Piştî qedandina werzê yekem û belavkirina bawernameyan, rêveberiya dibistanê xwest xwendekaran xelat bike. Ev xelat wê ne tiştekî heyberî be, lê jê zêdetir, wê razberî û zanistî be. Ji bo vê yekê, mamoste û rêveberiya dibistanê ketin tevgerê; da ku xelata xwendekaran, hêja û bi wate be.

Piştî qedandina dewamê hemû xwendekar bi alîkariya mamosteya xwe ketin otobîsê û berê xwe da cihê ku dibistanê ji wan re hilbijartîye. Bi mereqeke mezin û bi bendewarî dixwest nas bikin ew dê biçin ku.
Ji nişka ve otobîs li gel avahiyeke mezin rawestiya. Hemû xwendekar bi rêkûpêk daketin û berê xwe da nexweşxaneyê.

Bijîşkekî devliken û dilnizim di pêşwaziya xwendekaran de bû. Ew derbas kirin û li beşên nexweşxaneyê gerandin. Di nexweşxaneyê de, hin beş ji bo rewşên lazgîn, hatibûn amadekirin. Ev beş bijîşkekî din bi karê wê ve radibû. Xwendekaran silav li wî jî kir û gera xwe berdewam kir. Di heman nexweşxaneyê de bijîşkên çav, dil, hestî û zarokan jî hebûn.

Ji ber van dîmenên balkêş xwendekaran dest bi pirsan kir:



Arjîna biçûk got:

– Gelo çima her dem bijîşk devliken û dilnizm in?

Mamosteya Arjînê got:

– Ji ber ku karê bijîşkîyê karekî mirovî ye; girêdayî canê mirov e. Her dem kesê nexweş pêwîstiya wî bi moralhildanê heye.

Raman pirsî:

– Gelo ev pîşe nû ye yan kevin e?

Bijîşk bi pirsa Raman kêfxweş bû û ji xwendekaran pirsî:

– Xwendekarino! Heger kesek ji we nexeweş ket, beriya her kesî kî pê ve mijûl dibe?

Jiyanê got:

– Dayîka min, ew min derman dike.

Her kes jî tevlî gotina Jiyanê bû. Lewra bijîşk girnijî û dewam kir:

– Dayîk di her demê de bijîşk û dermankar e û ji kevin de pêşengiya vî karî kiriye. Dayîkê di serdemên berê de, ji bo dermankirina zarok û endamên malbatê, giha û şînatî kom dikirin û bi serpêhatiyan digiha encamên dawî. Lewra em weke bijîşka yekem di qada tenduristî de, lê dinêrin û ev kar bi demê re bi pêş ket heta gihaşt vê asta bilind.

Lazgîn jî derfet qezenc kir û pirsa xwe kir:

– Gelo çi kêmanî û şaşîtîyên vê pîşeyê hene?

Bijîşk bersiva Lazgîn da û got:

– Di her karî de kêmanî û astengî hene, lê ya herî ku mirov pê diêşe, hin bijîşk hene li vî karî wek karekî heyberî dinêrin û tenê armanca wan dibe qezenckirina diravan. Ev yek dûrî nirxê bijîşkîyê ye û ji bo me felaketa herî mezin e, ji ber ku nameya bijîşkîyê ji asta komkirina diravan mezintir û biwatetir e.

Di dawiya serdanê de, xwendekaran spasiya endamên nexweşxaneyê kir. Bi kêfxweşî vegeriyan û di dil û mejiyên wan de, coş û kelecaneke pir mezin hebû û soz dane mamosteya xwe ku ew dê her dem xwedî li nirxê bijîkiyê, derkevin.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Bijîşk çawa pêşwaziya xwendekaran kir?
2. Bersiva mamoste ji pirsa Arjînê re, çi bû?
3. Çi dihêle ku bijîşk ji nirxê xwe dûr bikeve?
4. Xwendekaran çi soz da mamosteya xwe?
5. Di nêrîna te de, rola bijîşkan di jiyanê de çi ye?
6. Heger tu di pêşerojê de bibî bijîşkek, tu dê çawa kar bikî?



# HÎNDARÎ

**1.** Em wateya peyva sorkirî hilbijêrin:

**a.** Ji bo me **felaketa** herî mezin e,

(Bobelat - Şahî - Şîn)

**b.** Hemû xwendekar bi rêkûpêk daketin û berê xwe da **nexweşxaneyê**:

(Cihê dermankirina nexweşan - Cihê firotina dermanan - Cihê çêkirina dermanan)

**c.** Lewra bijîşk **girnijî** û dewam kir:

(Axivî - giriya - bişirî)

**d.** Dayîk di her demê de bijîşk û dermankar e û ji kevin de **pêşengiya** vî karî kiriye:

(Serkêşî - Alîkarî - Daxwaz)

**e.** Bi **serpêhatiyan** digiha encamên dawî:

(Sersarî - Dilxweşî - Serborî)

**2.** Em bi hev re, peyvên li jêr di hevokên guncaw de, bi kar bînin:

- **Bijîşk**
- **Moral**
- **Soz**
- **Devliken**

**3.** Em wateya peyva "**nizm**" di hevokên li jêr de, diyar bikin:

– Hevalê min, mirovekî dilnizm e.

– Xaniyê cîranê me, nizm e.

– Asta vî xwendekarî nizm e.



## DERBIRÎN:

Tu jî li gorî xwe, mijarekê derbarê pîşeya bijîşkiyê de binivîse. Her weha, astengî û pêwîstiyên vê pîşeyê bi awayekî kurt bîne ziman.

## RÊNIVÎS:

**Ehmedê Xanî:**

Ehmedê Xanî helbestvanekî kurd e. Di sala 1651`ê de ji dayik bûye.

Ehmedê xanî ferhengeke piçûk ji bo zarokên kurdan nivîsiye. Navê wê pirtûkê “Nûbihara Piçûkan” e.

**Ne ji bo Sahibrewacan**
**belkî ji bo biçûkê di kurmancan**

**Ehmedê Xanî**

– Em nivîsa li jor baş fêm bikin û bi rengekî xweşik di lênûsa xwe de, binivîsin. Di nivîsa xwe de em li van tiştan baldar bin:

1. Tîp kengî mezin û kengî piçûk tê nivîsîn.
2. Tîp kengî bi peyvê ve û kengî jê dûr tê nivîsîn.

## XWEŞNIVÎS:

– Gotinên li jêr, gotinên pêşiyan in, bi rengekî xweşik di lênûsa xwe de, binivîse.

1. Kar şêr e, ku te rahişte wî dibe rovî.
2. Karkerê xwe be û şêrînê ber dilê hevalê xwe be.
3. Kevirê havînan biavêje bin kulînan.



# RÊZIMAN

## DEMA BÊ

- Em dê fêrî ziman, dîrok û wêjeya xwe bibin.
- Em ê vê ala rengîn bilind bikin.
- Hûn ê biçin rawestgehê.

Karên “fêrbûn, bilindkirin û çûnê”, di kîjan demê de rû dane?

| Dema Bûrî | Dema Niha | Dema Bê |
|---|---|---|
| | | |

## RÊGEZ:

Ev dema kar, bûyer û tevgerên ku tên vegotin, lê hîn pêk nehatine, diyar dike.

Em bi hev re, li gorî tabloyê, lêkeran di dema niha û bê de, bikşînin:

| Lêker | Dema Bê | Dema Niha |
|---|---|---|
| Vexwarin | | |
| Xwendin | | |
| Rakirin | | |
| Çûn | | |
| Kolan | | |



# DIRÛNKAR







## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Mirovên destpêkê çi cil li xwe dikirin?
2. Ji ber çi sedeman mirov cilan li xwe dikin?
3. Cilên hemû werzan, mîna hev in?
4. Kesên ku karê dirûtinê dikin, em çi navî li wan dikin?

Meta min dirûnkar e. Rojekê qevdika bentelonê min fetiqî û pêwîstiya wî bi dirûtinê hebû, lewra min cil guherîn û çûm gel wê. Bi dilxweşî pêşwaziya min kir. Dema wê qevdika pentelonê min didirût, li odeyê cilên daleqandî bala min kêşa; cilên kurdî û yên din pir spehî xuya dikir.

Min mereq kir û pirsî: Ji kengî ve tu vî karî dikî?

Meta min weha bersiv da: “Gelekî xwestka min a xwendinê hebû, lê mixabin li gundê me dibistan nebû û ew daxwaza min pêk nehat. Ji biçûkanî ve min ji pêlîstokên xwe re cil çêdikirin. Hema bêje min kiras, çarik, kember … li gorî karîna xwe bi destan saz dikirin. Ev dirûtin ji min re bû mîna arazoyekê.”

Birayê min ê mezin li arazoyê hay bû, lewre rojekê makîneyeke dirûtinê weke diyarî ji min re kirî.
Ez ji kêfan firiyam û roj bi roj hezkirina min ji vê pîşeyê re, mezin bû. Min roj bi roj û bi rengekî xweber, xwe li pêş xist.

Carinan heke modêleke bi min zehmet hatiba, min modêla nû dianî û xwe li ser rahênan dikir.

Min got: “Cilên kurdî pir xweşik xuya dikin!”

Meta min: “Belê Bengîn, cilên kurdî pir xweşik in û li gorî xwezaya welatê me ne. Cilên kurdî yên jinan pir xweşik in; jina kurd bi van cilan mîna kevokeke çeleng xuya dike.”



Meta min weha berdewam kir: “Anha karê dirûtinê pir fireh û bipêşketiye.”

Di dema me de kargehên biçûk ên dirûtinê çêbûne. Her weha alavên wê jî pir bûne. Bi rêya dirûnkariyê hem mirov bi cil dibin û hem jî spehîyekê didin bejin û bala mirov.

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çima Bengîn çû gel meta xwe?
2. Çi bala Bengîn kêşa?
3. Çawa meta Bengîn dest bi pîşeya dirûnkariyê kiriye?
4. Kê makîne ji meta Bengîn re, kirî?
5. Çawa meta Bengîn xwe li pêş xist?
6. Gava modêleke nû derdikeve, meta Bengîn çawa dike?
7. Tu cilên kurdî çawa dibînî?
8. Di dema niha de, pîşeya dirûnkariyê gihaştiye çi astê?

# HÎNDARÎ

**1.** Em ji vebijêrkên li jêr wateya peyvan hibijêrin.

**a.** Qevdik

Zendik - Destik - Deling

**b. Fetiqîn**

Qelişîn - Jihevçûna dirûtinê - Birçivîn

**c. Dilxweşî**

Tengezarî - Xemgînî - Şadî

**d. Kember**

Şûtik - Kum - Kemer

**e. Arazo**

Dilxwazî - Jêhatî - Kar

**2.** Em dijwateya peyva sorkirî nas bikin û binivîsin.

- Bi dilxweşî pêşwaziya me kir. (          )
- Cilên kurdî û yên din pir spehî xuya dikir. (          )
- Ji biçûkanî ve, min ji pêlîstokên xwe re cil çêdikirin. (          )
- Makîneyeke dirûtinê weke diyarî, ji min re kirî. (          )



**3.** Em bi peyvên li jêr ( navên parçeyên kincan) hevokan saz bikin.

(şal, bentelon, şûtik, şapik, qemîs, çarik, hûçik, kember, destmal, xeftan, kiras)

– ..................................................................

– ..................................................................

– ..................................................................

– ..................................................................

– ..................................................................

**4.** Em li gorî xwe hevokan sergihayî bikin.

– Ez kincên .........................................

– Em li malê ...........................................

– Jina kurd ...........................................

# RÊZIMAN

## CÎNAVÊN JIMARÎN

Hevokên li jêr bixwîne û cihên vala bi peyvên guncaw dagire:

– 6 mehan, 3`ê bi rê ketin.
– Şeş mehan, sê bi rê ketin.
– 5`an doza mafên xwe kir
– ...... doza mafên xwe kir
– 10`an bîra malê kolan
– ........ bîra malê kolan

Şeş, sê, pênc û deh, hejmar in. Ew cihên navan digirin.

– Şeş, sê ... hejmar in û cihên navan digirin, gelo çi navî em dikarin li wan bikin?

## RÊGEZ:

Cînavên Jimarîn: Ew jimar in ku bi nivîskî weke peyv li cihên navan tên bikaranîn.

**TÊBÎNÎ:** Hejmara “**yekê**” ne cînava jimarînê ye

Hejmarên li jêr, di hevokên guncaw de bi kar bînin:

**Deh - Heşt - Neh**

# NANPÊJ



Apê min jî nanpêj e
Karê wî pir dirêj e
Bi şev radibe ser xwe
Dike kar û barê xwe
Ard û avê tev dide
Hevîr ji wan çêdibe
Paşê tev dike girêk
Tenik dike wek mirêk
Hevîr davê nav agir
Sor dike germa kevir
Paşê radixe bi dar
Ew nanê germî taze
Qet naçe ji bîra me
Apê min jî nanpêj e
Bala wî pir dirêj e

**(Yûnis Bahram)**

## WATEYÊN PEYVAN:

**Nanpêj**: Kesê ku nan dipêje.

**Girêk**: gilok, girikên hevîrî

**Taze**: Nû

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Di kar de, çi taybetiya apê nanpêj heye?
2. Kengî kar û barê xwe dike?
3. Beriya avakirina nanpêjgehê, ji bo bidestxistina nan, çi dihat bikaranîn?
4. Sê cureyên nan binivîse?
5. Navên alavên ku di nanpêjgehê de, tên bikaranîn binivîse.
6. Helbestvan di rêya vê gotinê re dixwaze çi diyar bike?
   **"Paşê tev dike girêk / Tenik dike wek mirêk"**
7. Ji helbestê malika ku bala te kêşaye binivîse.





# BEŞA PÊNCEM

## Waneyên Beşê

- Kerê Derewîn
- Destpakî
- Zingilê Dadmendiyê

## Armancên Beşê

1. Naskirina hin nirxên civakî û sûdên wan.
2. Di kar û jiyanê de, naskirina nirxê dilsoziyê.
3. Fêrbûna parastina sparteyan.
4. Parastina nirxê dadmendiyê.

# KERÊ DEREWÎN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Tu bi hevalên xwe re, demeke çawa derbas dikî?
2. Nêrîna te li ser mirovê derewîn û xapînok çi ye?
3. Çima pêwîst e her dem mirov rastiyê bibêje û derewan neke?
4. Çima her kes ji mirovê rastgo hez dike û rêzgirtinê ji wî re digire?

Rojekê ji rojan, sibehê zû, çêleka sor ji malê derket û di nava zeviyan de digeriya. Carekê dît ku kulmeke genim li erdê ye, çêleka sor genim bi lez bir û di dilê xwe de got ku ew û hevalên xwe dê bi hev re, vî genimî bixwin. Çêlekê bang li hemû hevalên xwe kir û ew kom kirin.

Hesp got: "Çêleka sor, te xêr e! Çima te em kom kirine?"

Çêlekê bersiv da:

– Min ev genim li erdê dîtiye û ez dixwazim em bi hev re bixwin.

Mirîşk bi dengekî bilind keniya û ji çêlekê re got: "Hevala delalî, ev kulma genim, dê kî bixwe û kî nexwe; ew têra yekê tenê ji me nake."

Dema ku mirîşkê ev gotin got, çêlekê li kulma genim nerî û got: "Bi rastî jî wisa ye; ev kulma genim pir hindik e."

Hesp got: "Pêşinyareke min heye, ka em vê kulma genim biçînin, heta ku simbil ji wê çêbibin û piştre em ê biçinin, wê çaxê dê gelek genim ji wê bê û têra me hemûyan bike."

Mihê got: "Ev pêşinyareke pir baş e, ma ne wisa ye hevalino?"

Hemûyan ev pêşinyara hesp pejirand û bi hev re kulma genim çand. Roj derbas bûn û genim şîn hat, hemû li wî miqate bûn û her ku tî dibû, bi hev re dibûn alîkar û ew av dida.



Carekê ji caran, ker bi tenê di ber genimê şîn re derbas bû. Ker birçî bûbû û dilê wî bijiya genimê şîn. Ker di dilê xwe de got: “Bi xwarina gurzekê yan du gurzan, hevalên min tengezar nabin.” Ker du gurz genimê şîn xwarin, lê ji wan têr nexwar û ji xwe re got ku ew çend gurzên din jî bixwe, tu kes bi vê yekê hay nabe û dernaxe. Bi vî awayî, ker genim gurz bi gurz hemû xwar û ji wir meşiya. Dema ku çêlek û mirîşk çûn li rewşa genim binêrin, dîtin ku genimê wan ne li cihê xwe ye.

Çêlek û mirîşkê bi lez, hemû lawir li ber mala hesp kom kirin û ew bûyer ji wan re ragihand. Dema ku hesp ev bûyer bihîst, berê xwe da hemû lawiran û weha got: “Genim ji ber xwe ve naçe, heger hebe hinekan xwariye û aniha yê ku wisa kiriye, divê li xwe mukir bê.”

Hemû lawir bêdeng man, lê piştî kêliyekê, ker ber bi hesp ve çû û weha got: “Ez dizanim kê genim xwariye. Îro dema ku ez di ber genim re derbas dibûm, min dît ku mihê genim dixwar.”

Mih li hev ket û dest bi sûndan kir ku ne wê genim xwariye. Ker bi rengekî jixwebawer, li mihê vegerand: “Bes derewan bike! Min bi çavên xwe dît ku te genim dixwar.” Hemû lawiran ji ker bawer kir û mih tawanbar kir û biryar dan ku tu kes nema bi wê re bide û bistîne.

Miha reben dest bi girî kir û bi dilxemgînî berî da malê. Ker bi kêf çû malê û piştî ku ket hundir, bi dengekî bilin dest bi ken kir û weha got: “Miha belengaz, her kesî bi sûcekî ku te nekiriye, tawanbar kir, lê qet kesekî guman nekir ku min genim xwariye.”

Dema ku ker weha diaxivî, hesp û çêlek di ber mala wî re derbas dibûn. Hemû gotinên ker bihîstin û rastî nas kir. Hesp û çêlekê bi lez agahî da lawirên din û hemû çûn mala mihê û lêborîna xwe ji wê xwest. Piştre hemûyan berê xwe da mala ker. Dema ku ker ji mal derket, matmayî ma ku hemû lawir li ber deriyê wî rawestiyane.

Hesp, weha got: “Dema ku tu bi xwe re diaxivî, me dengê te bihîst û me nas kir ku te genim xwariye û te mih bi derewan tawanbar kir.”

Ker neçar ma ku li xwe mukir bê û lêborîna xwe ji wan xwest. Lê çêlekê ji wî re got: “Heger destpêkê tu li xwe mukir bihata û bi derewan mih tawanbar nekiriba, me yê li te bibûranda, lê te derew li me hemûyan kir û em xapandin. Ji îro û şûn de, em te nema di nava xwe de dihewînin. Cihê derewîn û xinizan di nava me de tune ye.”

## WATEYÊN PEYVAN:

**Pêşinyar**: Pêşkêşkirina çareyekê yan nerîneke din.
**Pejirandin**: erêkirin, qayilbûn
**Gurz**: Baq
**Tengezar**: tengijîn, acizî
**Ragihandin**: agahdarkirin, diyarkirin
**Bûyer**: Tişta ku rû daye.
**Mukirhatin**: Rastgotin
**Li hev ket**: Nema dizane çi bike.
**Tawanbarkirin**: Sûcdarkirin
**Biryar**: Ferman
**Guman**: dudilî, nepiştrastbûn
**Xiniz**: Xayin

## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çêleka sor, çi li erdê dît û çima bi xwe re bir?
2. Çima mirîşk bi dengekî bilind keniya?
3. Ji bo kulma genim, hesp çi pêşinyar kir?
4. Çima ker mih bi xwarina genim tawanbar kir?
5. Her kesayetek ji kesayetên çîrokê yên li jêr bi çi tên naskirin:
   - Çêlek ..................................................
   - Hesp ..................................................
   - Ker ..................................................
6. Li gorî têgihaştina te ji çîrokê re, serenavekî nû ji çîrokê re hilbijêre.
7. Te çi pend ji vê çîrokê derxist û çima?

# HÎNDARÎ

**1.** Em van peyvên li jêr di hevokan de, bi kar bînin:

**Pêşinyar - Alîkarî - Bûyer**

**2.** Em bi hev re, peyvên li jêr bigihînin dijbera wan

- Çandin
- Hevaltî
- Kombûn
- Rastî

- Belavbûn
- Çinîn
- Derew
- Dijminahî

**3.** Em wateya peyva (xwar) di hevokên li jêr de diyar bikin:

– Ker genim xwar.
– Mihê sûnd xwar.
– Ker mafê mihê xwar.
– Rêya xwar ji gayê pîr e.

## ÇALAKÎ:

– Tu û hevalên xwe, çîroka Kerê Derewîn bi awayekî şanoyî li dibistanê ji mamosteyên xwe re pêşkêş bikin.



## RÊZIMAN

## CÎNAVÊN NEBINAVKIRÎ

– Peyvên li jêr, di hevokên guncaw de bikar bîne:

**Hemû - Her kes - Hin kes - Gelekan**

1. Hemû rabûn ser pêyan
2. Her kes ..................................
3. Hin kes ..................................
4. Gelekan ..................................

Peyvên (hemû, hin kes, her kes, gelek) tiştên nediyar, destnîşan dikin.

## RÊGEZ:

Cînavên nebinavkirî: Ew cînav in ku cihên navên nediyar digirin.

– Di hevokên li jêr de, cihê cînavên nebinavkirî diyar bikin:

1. Me, hemû nas kirin.
2. Hinekan, zora gelekan bir.
3. Tu kes ranahêje barê ketî.
4. Her kes ji bo welatê xwe kar dike.



# DESTPAKÎ



Di çaxê bêhnvedanê
Li hola dibistanê
Şagirt jê derketin der
Bi lîstik û bi tevger
Li hewşa wê bela bûn
Hin dihatin, hin diçûn
Gorgîn şagirtê çeleng
Wî dixwend bê his û deng
Qelemek dî li erdê
Hêdîka rahişte wê

Go teqez a yekî ye
Lewra ji wî ketiye
Divê ez wê hilînim
Heya xwedî bibînin
Zengil dabû zingînê
Şagirt ketin komînê
Dema ketin refê de
Mamoste hat ji wê de
Hemî ji ber wî rabûn
Rûniştin û mijûl bûn
Gorgîn qelem diyar kir
Ji refê pirsiyar kir
Min ev qelem dîtiye
Gelo xwediyê wê kî ye?
Ku mamoste wisa dî
Bi kêfxweşî û şadî
Go tu qenc û dilsoz e
Ev karê te pîroz e
Pile danê diyarî
Ku ev jî alîkarî
Ew şagirtên dibistan
Hemya çepik jêr` kutan
Kêfa xwe jê re anîn
Mamoste go aferîn

**(Salihê Heydo)**

# GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Gorgîn pênûs kengî û li ku derê dît?
2. Dema ku Gorgîn pênûs dît, çawa tev geriya?
3. Ji bo vegerandina sparteyê, Gorgîn çawa tev geriya?
4. Xêzikên helbestê yên ku helwesta mamoste li hember Gorgîn destnîşan dikin, binivîse.
5. Ji helbestê çar xêzikên ku kêfa te ji wan re hatiye, binivîse.
6. Li gorî te, destpakî çi ye?
7. Em peyvan bigihînin wateyên wan:

| | |
|---|---|
| Çax | Xweşik |
| Hol | Her bijî |
| Çeleng | Dem |
| Teqez | Qad |
| Aferîn | Tekez |



# RÊZIMAN

## CÎNAVÊN BERBIHEVÎN

– Bihizire û paşê bersivê bide:

1. Berxwedan û Evînê hev nas kir.
2. Ararat û Ronakê hevalên êk in (hev in).

– Gelo, destpêkê Berxwedan, Evîn nas kir an Evînê, Berxwedan nas kir?

– Gelo, Ararat hevalê Ronakê ye yan Ronak hevala Ararat e?

**Hev û êk**, cînavên berbihevîn in.

### RÊGEZ:

Cînavên berbihevîn: Ew cînav du aliyên ku li hember hev heman karî dikin, rave dikin.

– Em du hevokan bi alîkariya cînavên berbihevîn saz bikin.



## AGAHIYÊN WÊJEYÎ

Helbesta li jêr, ji çar malikan pêk tê. Di her malikekê de, çar xêz hene, em ji her çar xêzan re dibêjin **"çarîn"**.

| | | |
|---|---|---|
| Bi dilsozî û duristî | Xêz | Çarîn |
| Bi têkiliyên xweristî | Xêz | |
| Bê xapandin û xiniztî | Xêz | |
| Jiyan dimîne parastî | Xêz | |

– Tu jî helbestekê hilbijêre û binivîse, tê de xêzik û çarînan destnîşan bike.

### Rênivîs:

**Melayê Bateyî:**

helbestvanekî kurd e. Ew li gundê Batê ji dayik bûye. Gelek helbest rêsane û dîwanek li pey xwe hiştiye. Di helbesta li jêr de, dabaşa birêveçûna xwe dike:

**Ji çiriya paşê û pê da**
**Melayê Bateyî kanê?**
**Sefer kêşa bi Muksê da**
**Li ser wextê zivistanê**

**Vê helbesta li jêr baş bixwîne û bi rengekî rênivîsî, binivîse.**

# ZENGILÊ DADMENDIYÊ



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Mirovê bindest çawa digihêje mafê xwe?
2. Gelo di dema çarekirina dozekê de çi pêwist e?
3. Çima mirovê dadmend di nava civakê de tê hezkirin?
4. Hebûna dadmendiyê di nava civakê de, çi peyda dike?

Di demeke kevin de, li bajarekî bi navê Bajarê Dadmendiyê, qiralekî dadmend hebû. Her dem dadmendî û wekhevî di nava xelkên bajarê xwe de, peyda dikir. Rojekê alîkarê vî qiralî derbasî cem wî bû, rewşa bajar ji wî re got û xwest ku zengilekî li bajar hilawistîne, heta ku çi kesê rastî zilmê û newekheviyê hatibe, di rêya wî zengilî re, hewara xwe bigihîne qiral û alîkariya wî bê kirin.

Qiral biryara hilawistîna zengil da û xwest ku bi benekî dirêj bê hilawistin, heta ku biçûk û mezin bikaribin bigêjine wî. Lê piştî demeke nedirêj, ev ben qetiya. Zengil bi rengekî demikî bi şaxê dara tirî ve hat girêdan; heta ku çareyekê ji wî re bibîne.

Di heman bajarî de, zilamekî çavteng û destgirtî dijiya. Hespekî wî hebû, ew ji bo karê xwe bikar tanî. Dema ku ev zilam mezin bû û êdi nema dikarîbû kar bike, ji bo ku hesp nema bi êm û av bike, dest ji wî berda. Di vê demê de hesp pir birçî bû û êdî rewşa wî pir aloz bûbû. Rojekê dema ku hesp di rêyekê re dimeşiya bi hêviya dîtina tiştekî ku bixwe û xwe têr bike, rastî  zengilê ku bi dara tirî ve hilawistî bû hat. Hesp devê xwe avêt şaxa darê heta ku bixwe, lê ji ber lewazî û birçîbûna zêde nikarîbû şaxê qut bike û bixwe. Di vê demê de, zengil lêdide, xelkên bajar deng bihîst. Ew li hev kom bûn û piştî hin pirs û bersivan, çîroka hesp û xwediyê wî yê çavteng nas kir.



Qiralê dadmend: “Di bajarê dadmendiyê de, çênabe ku bêmafî li tu tiştî bê kirin; ne li lawir û ne jî li mirovan û daxwaz kir ku xwediyê hesp bînîn dadmendiyê.”

Dema ku yek ji parêzvanên qiral çû xwediyê hesp bîne dadmendiyê, xwediyê hesp pereyên xwe dijmartin û kom dikirin.

Parêzvan agahî da wî, lê mirovê çavteng got: “Ez bi temenê xwe mezin im û nikarim bimeşim.”

Parêzvan got: “Heger tu li hespê xwe baldar bûya, anha wê bi kêrî te bihata.”

Dema ku xwediyê hesp gihaşt cihê dadmendiyê, ji ber karê wî yê xerab di mafê hesp de, xelkên gund êrîşî wî kir, lê qiralê dadwer rê neda wan û got: “Li bajarê dadmendiyê nabe ku em ziyanê bigihînin kesekî”. Piştre ji xwediyê hesp pirsî: “Vî hespî gelekî alîkariya te kir û te ji xizaniyê rizgar kir! Çima te ew paşguh kir”.

Mirovê çavteng tu bersiv ji vê pirsê re nedît, lêbûrîna xwe xwest û daxwaza vegerandina hespê xwe kir; heta ku ji nû ve wî bi xweşî xwedî bike. Lê qiralê dadwer, ev yek nepejirand û bi dengekî bilind got: “Em ê nîvê pereyên mirovê çavteng bibin û bi wan pereyan ji hesp re êm peyda bikin û cihekî ku wî ji serm û germê biparêze çêbikin.” Hemûyan bi hev re bang kir: “Bijî dadmendî!”



## GUFTÛGOYA WANEYÊ

1. Çima qiral biryara hilawistina zengilê da?
2. Çima mirovê çavteng dest ji hespê xwe berda?
3. Çima hesp nikarîbû şaxê dara ku ben bi wê ve hatibû hilawistin, biqetîne?
4. Çima zengil bi benekî dirêj hat hilawistin?
5. Di dawiyê de, qiralê dadwer çi biryar da?
6. Çi sûdên dadmendiyê hene?
7. Dema hevalekî te zorê li mirovekî bike, tu dê çi bikî?
8. Tu ji mirovê zordar an ji yê dadmend hez dikî û çima?



# HÎNDARÎ

1. Em bi hev re, hemwateya rast hilbijêrin:

a. **Hewar**:

Gazî - Parastin - Dûrketin

b. **Ziyan**:

Xirabî - Alîkarî - Wekhevî

c. **Peydakirin**:

Gihaştin - Xwendin - Bidestxistin

d. **Dadwer**:

Karker - Mamoste - Mafnas

e. **Rizgarkirin**:

Bindestî - Azadkirin - Talankirin

f. **Êm**:

Xwarina dewaran – Xaniyê dewaran – Çêlîkên dewaran

g. **Qiral**:

Bira - Şah - Neyar

2. Em van peyvên li jêr di hevokên guncaw de bi kar bînin:

- **Çavteng**
- **Dadmendî**
- **Alîkarî**
- **Temen**

**3.** Em wateya peyva “**deng**” di van hevokên li jêr de, binivîsin:

- Melayê Cizîrî helbestvanekî binavûdeng e.
- Çîroka wan li cîhanê deng veda.
- Wî deng nekir.
- Dîlanê dengê xwe dide mirovê demokrat.

## DERBIRÎN:

Tu jî bi çend xêzan derbarê dadmendî û mirovê dadmend de binivîse, yan jî kurteçêrokekê di vê derbarê de binivîse.



# RÊZIMAN

## DAÇEK

– Em bi wan re ketin gotûbêjê.
– Xwendekar ji mamoste pirsî.
– Şervanan li ber xwe da.
– Ew di ber dara tûyê re, derbas bû.

1. Gelo ev peyv (bi, di, li, ji), xwedî wate ne yan na?
2. Em çi navî li wan dikin?

## RÊGEZ:

Daçek: Ew curepeyvên ku ne watedar in, lê erkdar in.

– Valahiyên li jêr, bi daçekên guncaw dagire:

1. Mirov .......... pirsê digihê Xursê.
2. .......... Şoreşa Rojavayê re, guhertin çêbûn.
3. Baran .......... ewrên reş tê, kar .......... dilê xweş tê
4. Masî .......... avê de nayên bazarkirin.
5. .......... gel neyaran, ne .......... beyaran.

# Belavkirina Waneyan li ser Sala Xwendinê

| Meh \ Hefte | Hefteya Yekem | Hefteya Duyem | Hefteya Sêyem | Hefteya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Hevaltî | Xunco û Xecokê |
| Cotmeh | Komîn | Rêziman | Simo, Sofî û Mela | Têkiliyên Civakî |
| Mijdar | Em Welatê Xwe Nas bikin | Tilhelef | Gundê Mûriyan | Gundê Mûriyan |
| Berfanbar | Rêziman | Şehîd Peyman | Ala Rengîn | Rêziman |
| Rêbendan | Elektrîk | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Enternêt | Rêziman | Endazyar | Stêrk |
| Avdar | Mamê Hesinkar | Rêziman | Cotkar | Bijîşkî |
| Cotan | Dirûnkar | Nanpêj | Kerê Derewîn | Destpakî |
| Gulan | Zingilê Dadmendiyê | Lêveger | | |

